Hinek kes medyayê ji bo xwe bikartînin

» RÛPEL 9



Çand

Zewaca çewt seksê diqedîne

» RÛPEL 8



Tendûristî

Versiyona çapkirî ya HAWAR NET.comê / Çapa Dîjîtal / 05.05.2010
Hejmara 9

Rojnameya Kurdî a serbixwe

hawarnet.com / hawar.hk-mg.net/PESKETIN

agahi@hawarnet.com

Pêşketin

Kurd li metrepolan zêdetir asîmîle dibin!

• Asîmîlasyona ku dewleta tirk ser kurdan dimeşîne di nava koçberên kurd zêdetir bibandor e.

Amed (Pêşketin): D.BEKÎR (Pêşketin) Wek tê zanîn dewleta Tirk bi qedexe kirina zimanê kurdî perwerdeya bi zimanê kurdî ev 90 slae dixwaze zimanê kurdî ji holê rake û Kurdna asîmile bike. Dewleta Tirk di vê politikaya xwe de ne bi temamî be jî serdikeve.

Bi tesîra hewlên asîmîle kirinê a dewleta Tirk a bi riya dibistanan, televizyonên tirkî ûbi medyaya Tirkî gellek pêşveçûye.

Her wiha serde jî zêdetirê Kurdên ku qeyîlî asîmîlasyonê ne jî aliyariya hewlên dewleta Tirk dikin. Malbatên kurd zarokên xwe re hînî zimanê kurdî nakin û di jiyana rojane de zimanê kurdî bikarnaynin. Gellek rexistinên kurd jî alikariya hewlên asîmîlasyona dewleta Tirk didin.
Li gor lêkalînan wisa diyar dibe ku herî zêde jî Kurdên ku li dervey bajarên Kurdistanê dijîn ji ber gellek sedeman zêdetir asîmîle dibin û zimanê xwe ji bir-

Dewama nûçe di rûpela 3'an de



HAWAR NET bi dosyeya "Br bi Konferansa Netweyî" mijara Yekîtiya Kurdan xiste rojevê. R7



Qûrbanên kareseta li Meksîkayê

Nefta ku ji ber qezaya platforma neftê pêk hat bi hezaran giyanwerên deryayê mirin . rûpel 7

Jinên Kurd wê pêşengiya Konferansa Neteweyî jî bikin r2

BDP amadekariyên mertalên zindî dike r2

Di 3 mehan de 1549 Kurd hatin destgirkirin r2

Gelo Belçîka ber bi 2 dewletê ve diçe? r7

Dewê cerbandî çêtire ji mastê jehirkirî EMER SINDÎ r5

Navê Kerkûk di mêjûyê da B.Î. DEHLENÊWÎ r6

Esas "nankor" hûn in ZINARÊ XAMO r6

Kî ji yekitiya neteweyî direve? TAYYÎP TEMEL r7

Konferansa Neteweyî û Pêwîstiya Stratejiyeke Nû Zilkîf XWEŞHÊVÎ r7

Naveroka Din
» Zanist **r.8**
» Aktuel **r.10**
» Çand **r.8**



Çiyayê ku hemû cîhanê xetimand lê bi dîman ku derxist holê heyirand

Skandala tecawizê a li Sêrtê mezin dibe » r.6

Li Sêrtê, şoqa ku bûyera tecawûzê çêkiribû, ku di nav de cigirê midûrê dibistanekê jî, 25 kesan tecawûzî 4 xwendekarên keç kiribûn, vê carê jî Berwarî bi bûyereke tecawûz û kuştinê ya ku 9 xwendekarên dibistana seretayî tev bûnê hejiya

GOTAR
Hikûmeta Sûriye, kurdan ji axa wan derdixe
SERCAN MEHMÛD **r5**

ZANIST
Gelo galaksiya me de çend gerstêrk hene?
R8

ÇAND
Albûma stranbêja nû Newroza; "Nû" bi we re ye R8

GOTAR
Çend Diyarbekîr hene?!...
Serhad B.RÊNAS
R8

Jinên Kurd wê pêşengiya Konferansa Neteweyî jî bikin

Jinên Kurd, ji bo mezinkirina têkoşîna azadiyê, gaveke girîng avêtin.



AMED (Pêşketin)

Konferansa Neteweyî ya Jinên Kurd ku ji aliyê Tevgera Jinên Azad û Demokratik ve tê organizekirin îro jî berdewam kir. Ji çar parçeyên Kurdistanê siyasetvanên jin û nûnerên gelek saziyên jinan tevlî konferansa li Amedê bûn.
Parlementera DEPê ya berê Leyla Zana, doh di vekirina pêşengehê de, bi gotina "Amed mala hemû jinên Kurd e" jin pêşwazî kiribûn.

Konferansa Neteweyî ya Jinên Kurd îro jî bi çalekiyên cuda berdewam kir. Konferansa îro ji çapemeniyê re girtî bû. Heta ku nûçeyên me amade bû jî, konferans dewam dikir lê wek tê zanîn ew ê îro konferans bidawî bibe û dê encamnameya konferansê ji bo raya giştî bê belavkirin.
Li Amedê bi pêşengiya Tevgera Jinên Azad û Demokratîk (DOKH) û Leyla Zanayê, Konferansa Neteweyî ya Jinên Kurd a bi navê "Di Pêşvebirina Demokrasiyê De Rista Jinan" hate lidarxistin. Di konferansê de bi gişti pirsgirêkên kurdan û bi taybetî jî yên jinan çi ne, hatin nîqaşkirin.

Ji înkar û redkirina nasnameyê bigirin heta gelek şiklên şîdetê, yên wekî recm, sunetkirina jinan, kuştin û qetilkirina jinan ên li ser navê namûsê, şîdeta li malê, berdêl, zewaca bi darê zorê, şîdeta cinsî ya ku ji hêla dewletê ve pêk tê, tacîz û tecawiz û qedexekirina zimanê zikmakî, enfala Iraqê û hwd. û şiklên cudahiyên piralî û rêbazên têkoşînê yên bi wan pirsgirêkan 2 rojan nîqaş kirin.
Ji Amerîka û Ewropayê bigire heya Iraq, Îran û Sûriyeyê jinên siyasetmedar, akademîsyen, nivîskar, hunermend û nûnerên saziyên jinan tevlî konferansê bûn. Jinên ku tevlî konferansê bûn gotin ku ev hevcivîna jinên kurd a hemû parçeyan gelek girîng e û dîrokî ye. Jinên kurd gelek cihan cihên cuda cuda mijarên cuda cuda gihiştin hev. Lê cara yekem li Amedê ji bo konferansa jinên kurd civiyan û bi zaravayên kurdî xebatên xwe parvekirin. Jinên ku wekî axaftger tevlî konferansê bûn qala jiyana jinên li herêmên xwe kirin. Di axaftinan de derket holê ku çend wekî erdnegarî bi sînoran hatine xez kirin jî dîsa jî pêkanînên li hemberî jinan, fikr û ramanên jinan û daxwazên van yekin.
Nivîskarên rojnameya me Mamoste Xemrevîn, Mizgîn Bingol, Hêvî Berwarî, Necîbe Qeredaxî, Felaknaz Uca û Sevahir Ji konferansa jinan 'konferansa neteweyî' derket
Ji "Konferansa Jinên Kurd" ku bi beşdariya 150 delegeyên jin ên ji Herêma Federal a Kurdistan, Îran, Suriye, Ewropa û Amerîkayê pêk hat de, pêşniyara "Konferansa Neteweyî ya Kurd" derket.
Encamnameya ku bi zaravayên kurmancî û soranî û bi tirkî hatibû nivîsandin, ji aliyê Parlamentera berê ya DEP'ê Leyla Zana ve hate xwendin
HAWAR NET.com

Abullah Demirbaş hate emeliyatkirin

Serokê Şaredariya Sûrê, Evdila Demirbaş, li Nexweşxaneya Perwerdehî û Lêkolînê ya Zankoya Dîcleyê ya Amedê hate emeliyatkirin. Demirbaşê ku di dilê wî de xitimîna reh heye anjiyo kirin. Serokê Şaredariya Sûrê, Evdila Demirbaşê ku li Girtîgeha Amedê girtî ye, îro li Beşa Kardiyolojiyê ya Nexweşxaneya Perwerdehî û Lêkolînê ya Zankoya Dîcleyê ya Amedê tê emeliyatkirin. Demirbaşê ku di rehên dilê wî de xitimîn heye anjiyo kirin. 'Di rasteka rapora ku derkeve de, em ê serî li Serdozgeriya Komarê ya Amedê bidin û daxwaza berdan û dermankirina miwekilê xwe bikin'

Ji konferansa netweyeyî ya jinên kurd emcamnameyeke girîng

AMED (Pêşketin)

- Konferansa me bi taybetî li hemberî polîtîkayên red û înkarkirina çand û nasnameya kurdan û bi gişti jî li hemberî hemû çand, nasname û olên ku hebûna wan tên înkarkirin, tunehesibandin û bi her awayî bi cudaxwaziyê re rû bi rû dimînin, xwe wekî riya armanca têkoşînê dibîne,
- Ji bo qadên kui hemû nasname û çand bên cem hev û şert û mercên wekhev ên civaka azad biafirînin, bangewaziya neteweyeke.
- Li deverên ku asîmîlasyona li ser çand û zimanê kurdî didome, têkoşîneke hevpar esas digre,
- Ji xeynî ku jinê weke cînsek bibîne û jê re çînek biafirîne na, rola pêşengiya wekî parçeyeke neteweya azad, wekhev û adîl dide,
- Li ku dibe bila bibe, hemû cureyên tundiyê yên li hemberî jinê, yên wekî berdêl, zewaca bi zorê, firehjinî, sinetkirina jinê, ferzkirina
- Nêrîna tekparêz û ya zayenda civakiya dewletî ya ku rê li pirsgirêkên siyasî, aborî û civakî vedike, ji bo çareseriya van, esasa Xweseriya Demokratik a Herêmî hedef digre,
- Konferansa me ji bo ku hemû pirsgirêkên me yên hevpar re çareseriyê bibîne, di nava baweriyekê de, vexwendina ji bo kombûna Konferansa Neteweyî ya Kurd a Demokratik dike.



Xwendekarên zaningeha Dîcleyê terora polîsên Tirk protesto kirin



Xwendekarên Zankoy Dicleyê li ber baxçeyê zanîngehê, heta ku hevalê wan ê ji aliyê polîsan ve bête berdan, dest bi çalakiya rûniştinê kirin.

AMED (Pêşketin)

Endamên DÜÖ-DER'ê, êrîşa polîsan a duhî ya li ser hevalên xwe protesto kirin. Xwendekaran, diyar kir ku heta hevalê wan bê berdan ew ê çalakiya xwe bidominin û li ber Fakulteya Edebiyatê dest bi çalakiya rûniştinê kirin.
Xwendekaran, bal kişand ku ketina polîsan a zanîngehan zanîngehên ku "hêlîna zanistê" ne, xirab dike û xwestin ku polîs kampûsa zanîngeha biterikînin.
Yek ji rayedarên rektoriya zanîngehê Mustafa Tuna, destnîşan kir ku ew vê çalakiyê rast nabînin û xwest ku xwendekar dawî li çalakiya xwe bînin.
Xwendekaran bertek nîşanî Tuna da û got, heta hevalê wan bête berdan ew ê çalakiya xwe bidomînin.Xwendekarên Zankoyq Dicleyê li ber baxçeyê zanîngehê, heta ku hevalê wan ê ji aliyê polîsan ve bête berdan, dest bi çalakiya rûniştinê kirin.
Duhî, bi dehan xwendekaran, bi hinceta ku bo pîrozbahiyên "şahiyên biharê" hay ji wan nekiriye, çalakiyeke protestoyî li dar xistibû û polîsan ew girtibûn. AJANSAN

BDP amadekariyên mertalên zindî dike

Serokên Bajar yên BDP'î ji bo ku peşveçûnên dawî binirxînin li Enqereyê li navenda giştî ya BDP'ê civînek pêk anîn.

AMED (Pêşketin)

Di civînê de mijarên wekî operasyon, mertalên zindî, guhertina makezagonê hate nîqaşîn û hat gotin ku der barê mijara mertalên zindî bername tê derxistin. Civîn bi serokiya hevserokên BDP'ê Selahattîn Demîrtaş û Gultan Kişanak pêk hat û di civînê de bi taybet jî guhertina makezagonê, amadekariyên operasyonê û zextên ku li ser BD'ê tên meşandin hatin nirxandin. Hate hînbûn ku di mijara guhertina makezagonê de serokên bajêr ên BDP'ê agahiyan bidin. Her wiha di civînê de mijara pirsgirêka kurd bê nîqaşîn û dê bê gotin ku hikumet ji bo çareseriya pirsgirêka bi BDP'ê re têkiliyan daneyniye û ji bo xebatên ku BDP'ê pêk bîne nîqaş bên kirin. Her wiha hat gotin ku mijara li dijî operasyonan ya mertalên zindî bernameyek be derxistin û li gorî bernameyê amadekarî bên kirin û piştî bername û nirxandinan kêmasiyên heyî careke din ber çav bê derbas kirin û kêmasî bên temamkirin. Dîsa bi girêdayî mijara kampanya rêxistinbuyînê dê bi mijara guhertina makezagonê de BDP sekneke çawa diyar bike agahî bê dayîn û starta hilbijartinê ji niha ve bê dayîn. HAWAR NET.com

Ji Xetîb Dîcle re 2 sal ceza

HEWLÊR (Pêşketin)

Bi hinceta ku encamnameya Kongreya Civaka Demokratik a par bi dawî bûyî xwendiye, 2 sal cezayê hepsê dan Xetîb Dîcleyê parlementerê Amedê yê berê yê DTP'ya qedexe kirî Xetîb Dîcleyê ku di çarçoveya Jêpirsîna KCK'yê de hê ji girtî ye, beşdarî danişîna ku di 5. Dadgeha Cezayê Giran a Amedê de bi rê ve çû nebû. heta Seyrangeha Koşûyolûyê hatiye kirin, encamnameya tê de Heyeta dadgehê, bi rayeya madeya 7/2. a Qanûna Têkoşîna Bi Terorê Re, ku çarçoveya tawana "kirina propagandaya rêxistinê" datîne, 2 sal cezayê hepsê da Dîcle."AJANSAN

Di 3 mehan de 1549 Kurd hatin destgirkirin, 503 kes jî hatin girtin

Şaxa İHD'yê ya Amedê rapora 3 mehan a binpêkirina mafan li herêmê eşkere kir. Li herêmê, di nava 3 mehan de 6 hezar û 734 kes rastî binpêkirina mafan hatin, hezar û 549 kes hatin destgirkirin û 503 kes jî hatin girtin..

AMED (Pêşketin):

Şaxa İHD'yê ya Amedê rapora binpêkirinên mafan a 3 mehan li 13 bajarên herêmê diyar kir. Rêveberê İHD'yê, Parêzer Rehşan Batarayê, beriya raporê diyar, ku zêdebûna binpêkirina mafan gumanên wan zêde dikin. Batarayê bi bîr xist, ku sala 2009'an bi binpêkirinên mafan derbas kirine. Batarayê derbirrî, ku ji 14'ê Avrêlê heta dawiya sale, li hemberî siyasetmedarên Kurd û rêxistinên sivîl binpêkirinan dom kirine û wiha pê berdewam bû: "Destgirkirin û girtinan heta mehên 2010'an ên Rêbendan û û Reşemiyê dom kirin. Ligel tevahiya bêhiqûqiyên, hê jî Zorooglu anî zimên, di nava 3 mehan de bi tevahî 6 hezar û 734 binpêkirinên mafan pêk hatine û wiha got: "Ji van, 1549 destgirkirin in, 503 girtin in, 198 şikence û 41 kes jî rasti desttêwerdana polîsan hatin. 40 kes birîndar bûn û der barê 929 kesan de jî jêpirsîn hatine destpêkirin."HAWAR NET.com

Encama israra operasyonan; 6 leşkerên Tirk mirin

Li gorî agahiyên HPG'yê şerek xurt di navbera yekîneyên Artêşa Tirk û gerîlayên HPG'yê de qewimiye. Hate diyarkirin ku di şer de 6 leşker hatine kuştin. Li gorî daxuyaniyê, Artêşa Tirk piştî windakirina leşkerên xwe, xwe paş ve vekişand. Ev sê rojin operasyonên li Şirnexê didomin û tank li ser sînorê Îraqê hatin bicîkirin. Hat diyar kirin ku cerdevan jî beşdarî operasyonê bûne. Her wiha ji liwayên Ikizce û Akçay yên li Şirnexê bi helîpkopterên Skosky cebilxane sewqî ser sînor têne kirin.

www.kurdi.org

Kurd li metrepolan zêdetir asîmîle dibin!

Asîmîlasyona ku dewleta tirk ser kurdan dimeşîne di nava koçberên kurd zêdetir bibandor e.

D.BEKÎR (Pêşketin)

Wek tê zanîn dewleta Tirk bi qedexe kirina zimanê kurdî perwerdeya bi zimanê kurdî ev 90 slae dixwaze zimanê kurdî ji holê rake û Kurdna asîmîle bike. Dewleta Tirk di vê polîtîkaya xwe de ne bi temamî be jî serdikeve.
Bi tesîra hewlên asîmîle kirinê a dewleta Tirk a bi riya dibistanan, televizyonên tirkî Û bi medyaya Tirkî gellek pêşveçûye.
Her wiha serde jî zêdetirê Kurdên ku qeyîlî asîmîlasyonê ne jî aliyariya hewlên dewleta Tirk dikin. Malbatên kurd zarokên xwe re hînî zimanê kurdî nakin û di jiyana rojane de zimanê kurdî bikarnaynin. Gellek rexistinên kurd jî alîkariya hewlên asîmîlasyona dewleta Tirk didin.
Li gor lêkalînan wisa diyar dibe ku herî zêde jî Kurdên ku li dervey bajarên Kurdistanê dijîn ji ber gellek sedeman zêdetir asîmîle dibin û zimanê xwe ji bîr-



Kurdên ku li dervey bajarên Kurdistanê dijîn ji ber gellek sedeman zêdetir asîmîle dibin

Ji bo yekîtiya Kurdan pêvajoya dîrokî

Wek tê zanin li Tirkîye 3 partiyên di çerçoveya mafên Kurdan de dixebitin hene.Yekem BDP,dûyem KADEP a Serafettîn Elçî û sêyemîn jî HAK-PAR e ku serokê wê partiyê Bayram Bozyel e. Divê Kurd êdî nêzîkî hev bibin û bo têkdana polîtîkayên dagirkeran û standina mafên Kurd di gelek waran de berxwe bidin. ev yek daxwaza hemû kurdan eû di rojên dawî pêŞketinên girîng di vî warî de çêdibin. Partiyên kurdan ên li Tirkiyeyê nîqaş dikin ku di mijarên neteweyî de bi hev re tevbigerin û wekî hev bertekan bidin. Partiya Aştî û Demokrasiyê (BDP), Partiya Maf û Azadiyan (HAK-PAR) û Partiya Demokrasiya Beşdariyê (KADEPji bo ku wekî partiyên kurdan ên li Başûr bi hev re tevbigerin, mercan dinirxînin.
Piştî pêşniyara "Platforma Neteweyî" ku pêşî HAK-PAR'ê anî rojevê, vê carê jî BDP'ê ji bo "Platforma Demokrasiyê" ya ji bo partiyên kurdan bi hev re tevbigerin, dest bi xebatan kir.Serokê Giştî yê HAK-PAR'ê Bayram Bozyel, Cîgirê Serokê Giştî yê KADEP'ê Yuksel Avşar û Cîgirê hevserokên BDP'ê Tuncer Bakirhan di daxuyaniyên dan AKnewsê de anîn ziman ku ew vê geşedanê erênî dinirxînin. Bayram Bozyel ku ji AKnewsê re axivî, got ku par ji bo avakirina "Platforma Neteweyî" bi DTP û KADEP'ê re hevdîtin kiribûn, her du partiyan jî ev pêşniyar erênî nirxandibû lê ji ber ku DTP hate girtin, navber dane pêvajoyê.
DERBARÊ MIJARÊ DE ZÊDETIR NÛÇE DI www.hawarnet.com DE

Kurdên li metrepolên tirkan xwedî li zimanê xwe dernakevin

Li gor lêkolîneka xwendekareke zaningeha Dîcleyê deketiye holê kurd ciwanên li metopoan dijîn Kurd bûna xwe qebûl bikin jî bi zimanê Kurdî napeyivin û heta bi dê û bêvên xwe re jî bi Tirkî diaxifin û dê û bavên xwe jî mecbûrî hîn bÛna zimanê tirkî dikin.
Li gor lêkolînê axaftina bi kurdî jî, ji sedî 89 daketiye 12'an.
Bi vê lêkolînê derket holê ku koçberên kurd li metropolan hêdî hêdî asîmîle dibin û êdî bi zimanê zikmakî naaxivin.
Li gor lêkolînê sedî 85 jî ji çanda xwe dûr ketine.

Kesên ku tevlî lêkolînê bûne gelek jê destnîşan kirin ku li ser zext û çewisandinên leşker û polîsan, ji neçarî cih û warê xwe terikandine.HAWAR NET.com



Li Amedê ji her 3 kesan 1'ê xwendekar e

Hejmara xwendekarên li Diyarbekîrê ji nifûsa 50 bajarên li Tirkiyeyê zêdetir e. Li gor daneyên wezareta Perwerdeyê ya dewleta Tirk ji sedî 35ê nifûsa Amedê xwendekar e. Li Amedê ku nifûsa wê digehêje nêzî 2 milyonê, 600 hezar xwendekar heye. Ev hejmar ji nifûsa 50 bajarên li Tirkiyeyê zêdetir e. Her wiha li gor daneyan nifûsa ciwan ya Amedê ser milyonekê ye. Tê diyar kirin ku li Amedê bi giştî pêwîstiya 6 hezar polên nû û pêwîstiya 5 hezar jî mamoste heye.

Skandala tecawizê a li Sêrtê mezin dibe

Li Sêrtê, şoqa ku bûyera tecawûzê çêkiribû, ku di nav de cîgirê midûrê dibistanekê jî, 25 kesan tecawûzî 4 xwendekarên keç kiribûn, vê carê jî Berwarî bi bûyereke tecawûz û kuştinê ya ku 9 xwendekarên dibistana seretayî tev bûnê hejiya

8 xwendekarên kur ên di navbera temenên 13 û 14 salî de û di Dibistana Herêmê ya Dibistana Seretayî ya Mecanî ya Atatürkê ya li Berwariyê de dixwînin, bi hinceta ku fotrafê nemunasib ê keça 15 salî ya xwendekara heman dibistanê kişandine, şantaj lê kirine, bi gefxwarinê zarokeke keç a 3 salî pê dane anîn û tecawûzî wê kirine û kuştine û piştî ku tecawûzî zarokê kurin ê 2 salî kirine û li ber çêm hiştine çûne, da ku bimire, hatin girtin. Li gorî nûçeya nûçegihanê DHA'yê, Cem Emir, li Berwariyê, vê 15'ê Avrêla bûrî, H. S. serî li Rêveberiya Emniyeta Berwariyê da, got, kurê min ê 2 salî E. S. winda bû, li ser vê ragihandinê jî, bûyer zelal bû. Piştî giliyê H. S.'yê bav, polîs lêgerîn da destpêkirin, dîmenên kameraya ewlekariyê ya Şaxa Leşkeriyê ya Berwariyê ya li nêzîkî malê ji bo lêkolînê girt.
Dema ku li navçeyê xebatên lêgerînê zêde bûbûn, nûçeyek hat, ku E. S.'yê 2 salî ji aliyê xwendekarên YİBO'yê ve li devera Çemê Serkaniyê hatiye dîtin. E. S.'yê kincên wî di herriyê geriyayî û li ber qerisînê, ji bo dermankirinê rakirin Nexweşxaneya Dewletê ya Berwariyê. Di muayeneya zarok de hate dîtin, ku di ciyên curecur ên laşê wî de birrîn û herişîn hene û hate destnîşankirin, ku tecawûzî zarok kirine. Piştî vê bûyerê bi rojekê jî, îxbareke din hate Rêveberiya Emniyeta Navçeya Berwariyê, ku zarokeke din winda bûye. Vê carê jî, A. S.'ya keça 3 salî ya apê E. S.'yê hatî tecawûzkirin winda bû. Wê hingê, keseki ku li malbata A. S.'yê geriya, got, "Min ew zarok tevî keçeke 13-14 salî dît, ber bi aliyê Çemê Serkaniyê ve diçûn". Polîs û ji xelkê navçeyê nêzîkî 200 kesan dest pê kir li derdora Çemê Serkaniyê li A. S.'ya biçûk geriyan. Saet 20.00 wan çaxan, li keviya hewza li jora çêm, termê A. S.'ya biçûk hate dîtin. Piştî otobsiya ku hate kirin, diyar bû keça biçûk piştî tecawûzbûnê bi xeniqandinê hatiye kuştin.
Polîs destnîşan kir, ku ev her du bûyerên di nava du rojan de li pey hev qewimî girêdayî hev in, dest pê kir li keça 13-14 salî geriya, ya ku hatibû gotin herî dawî ew bû tevî A. S.'ya piştî tecawûzê hatî kuştin hatibû dîtin..Ji bo dewama nûçeyê HAWAR NET.com

Li Efrînê terora dewleta Sûriye gihêş asta herî bilind



AMED (Pêşketin)

Li gundê Gewndu yê girêdayî bajarê Efrînê ye, bi sedan kes ji bo bîranîna gerîllayên jiyana xwe ji dest dane kom bûn. Lê hêzên dewleta Sûrî dor li gund girt û bi sîlehan êrîşî gel kir. Li ser vê yekê di navbera wan û ciwanan de pevçûn derket. Meha Adarê, Komîteya Şehîdan a KCK nasnameya 18 gerîllayên ji Efrînê yên di demên cuda de jiyana xwe ji dest dabûn eşkere kir. Ji ber ku hêzên dewleta Sûrî bîranîna gerîllayan asteng kirin, roja înê bi sedan kes li gundê Gewndu hatin cem hev û xwestin ji bo gerîllayan merasîmeke bîranînê lidar bixin. Lê eskerên dewleta Sûrî dor li gund girtin û bi sîlehan êrîşî gel kirin.
Hat ragihandin ku ji ber êrîşa eskeran jin û zarok birîndar bûne. Her weha herî kêm 15 kes jî hatin binçavkirin.. Ciwanên Kurd jî, bi keviran bersiv da êrîşa eskeran.. HAWAR NET.com

BDP'yê 'skandala tecawûzê ya li Sêrtê' bire parlemenê

LParlementerê BDP'yê yê Sêrtê, Osman Ozçelik, ji bo lêkolînkirina skandala tecawûzê ya li Sêrtê derketî holê, xwest li parlemenê Komîsyona Lêkolînê bê damezirandin.Parlementerê BDP'yê yê Sêrtê, Osman Ozçelik, piştî ku skandala tecawûzê ya li Sertê derkete holê, bûyer anî rojeva parlemenê. Parlamenter Ozçelik têkildarî mijarê pêşniyarnameya lêkolînê pêşkêşî Serokatiya Parlemenê kir û xwest ji bo ku ev bûyer bi hemû aliyên xwe ve bê ronîkirin, li parlemenê Komîsyona Lêkolînê bê damezirandin. Ozçelik di pêşniyarnameya lêkolînê de diyar kir, ku li gorî agahiyên ku ji hiqûqnasên li Sêrtê hatine girtin, di nava kesên ku ji ber bûyerê hatine destgirkirin de, li gel şêx û melayan, hin polîs û cendirmeyên ku rutbeyên wan nayên zanîn jî hene.

Gever bi 100 hezarî silav da Amedê

Newroza yekemîn a 2010'an li Geverê bi tevlîbûna 100 hezaran dest pê kir. Girse ji taxan bi meşê ber bi qadê ve meşiya. Meşa herî girseyî koma ku ji Bajêrgeh hatî, bi pankarta "Herêma Bajêrgehê Newrozê piroz dike" pêk anî. Bi hezaran kes bi qasî 6 kilometreyan meşiyan û hatin qadê. Ji ber tevlîbûna mezin a gel hemû rê li trafikê hatin girtin û di demekî kin de taxên navçeyê bêdeng bûn. Jin, zilam û zarok bi cil û bergeyên neteweyî li qada pîrozbahiyê rengê baharê dide her derê..



Dewê cerbandî çêtire ji mastê jehirkirî

EMER SINDÎ

Roja eyniya rêkevtî 26/03/2010-ê encamên helbijartinan ji aliyê komisyona bilinda serbexuya helbijartinan li Îraqê hatine ragehandin, li gorey komisyonê ragehandî: Lîsta Alîraqiye 91 korsî bidest ve anîne û lîsta dewleta Qanûnê 89 korsî û lîsta Îtîlafa nîştîmanî 70 û lîstên Kurdistanî 58 korsî.

Piştî ragehandina van encamên ku mirovî bê umêd dikin berêz Malikî serok wezîrên Îraqê daxûyaniyek da û têde xuyakir ku eve ne encamên dawiyê ne û sexte karî hatiye kirin herwesan jî gut: Gelo dibe hinek kesan li van helbijartinan serkeftin bi destve anîne, ew bi xwe tîroristin û bi tumeta koştin û tîrorkirina Îraqiyan hatîne desteserkirin û nihajî hinek ji wan dizîndanandene, anku ev encame ji aliyê serokê wezîranve nehatine naskirin

û danpêdan pê nehatiye kirin, lê hinek aliyan di daxûyaniyên xwe de xuyakirin û gutin ku dizanin sexte karî li hinek deveran hatiye kirin lê ji bo berjewendiya gîştî diviya em hemû rêzê li encaman bigirîn û biçi rengê hebe, û lîsta hevpeymaniya Kurdistanî ji bilî daxoyaniya serok Barzanî û pîroziya cenabê wî ji bo gelên Îraqê hiç tiştek din xuya ne bûye.

Hevpeymaniya Kurdistanî ji bilî daxuyaniya rêzdar Mesûd Barzanî serokê herêma Kurdistanê ku pîroziya xelkê Îraqê bi gîştî kir bo hiç daxûyaniyekê din ne hatiye dan. Gelo hevpeymaniya Kurdistanî hevpeymanî û hevbendiyê bi kîjan lîstê ji lîstên serkeftî re bike û bi kîjan alîre wê li hevbê û kîjan helbijarde di berjewendiya gelê kurd deye??! Ji ber ku kurd nimareyeka pirî giringe di hawkêşa siyasîda û hemû balansan ra digire, herweha jî bixwazîn yan nexwazîn leystekvanê serekî digorepana siyasî de îro kurdin û di her avakirinekêde li Îraqê kerestên serekî ne û nabe bêne paşguhêxistin. Ji egerê hebûna van xalên giring yên ku me li serî xweyakirîn,

gereke ji bo girêdana hevbendiyê bi her aliyekê re yan bi her lîsteyeka serkeftî re ji bo avakirina hikumeta nû pêtvî ye kurd bizane ew çend giringe û girane di hawkêşa siyasîde û di encamde kî menas dike û danpêdanê bi mafên me yên rewa dike û bi mercên rewayên me qayil dibe bi nivêsîn û dikomenit û dîdevan, bila hevbendiyê pêre girê bidîn ji bo avakirina hikumetê. Bi dîtina min mercên kurdan rohin û aşikerane û ji hemûyan aşkeratir:

1- Danpêdana ji dil bi desturê Îraqa fedral.

2- Çareserkirin û bi dawî anîna madê 140 .

3- Pirsgirêka pêşmergeyê Kurdistanê.

4- Girêbest û kontirakên petrola Kurdistanê.

Xwandina min ji bo dîtin û buçûnên aliyên siyasî: Erebên Sune mezheb ewên li bin sêhwana lîsta Alîraqiye de li hev civiyayîn bê hîç şermek yan veşartinek hebe, xweziyan li sîstemê take hizbiyê dixwazin û Besiyan bi gunehbar nizanin û bi rêka vê lîstê çendîn Besyên gunehbar deng anîne û wê bikeve di perlemanê Îraqê de û li jêr hinek navên din dixwazin dîsan bigehine gupîtka desthelatê ez dibêjim serkirdayetiya kurdî vê yekê baş dizane û bawer nakim bikeve şaşiyeka hosa mezin û dîrokî ku hevbendiyê bi lîsta Alîraqiye re bike her çende eger lîsta Alîraqiye hikumetê ava bike li gel her aliyekê din wê hikumeteka pirî bi hêzbe, çunkî hemû dewletên cîran yên Sune mezheb mîna Sudiye û Surye û Ordin li gel Turkiya û zêdebarî Emerîka piştgîr û piştevanên Elawîne ji bo kêm kirin û nehêlana rolê Îranê.

Eve aliyekê dîmenê siyasiye li Îraqê û bijardineke ji bo hevpeymaniya Kurdistanî, lê aliyê din yê vê dîmenî: Kurd dikarin ji bo avakirina hikumetê ligel lîsta Dewleta Qanûnê û lîsta Îtîlafa nîştîmanî li hev werin û çavên xwe li maytêkirina Îranê bi niqînin û serok komarek kurd û çendîn wezaret û postên siyadî bi dest ve bînin, lê pal

hikumeta ku wadê wê bi dawî hatî anku hikumeta Malikî kurdan postê serok komarî û çendîn postên giring wergirtibûn gelo van postan karîn ji bo kurdan çi bikin??!!

Erê kurd bi mînin opozisyon û gorekê bi opozisyoneka xwey wijdan û bihêz regirê bidin ji bo bidest ve anîna mafên rewayên kurdan? Yanjî bi lîstên serkeftî re li hev werin û hikumetê ava bikin?? Têbîniya dawiyê: Hîvîdarim her kurdek bitaybetî rayedarên kurdan wê yekê ji bîrnekin: Ku eger Eyad Elawî serkêşê lîsta Alîraqiye bivêt jî tiştekê baş ji bo kurdan bike û pêngaveka pozetîv bavê dîsan dewrû berên wî giropa navdar ya pêkhatî ji Salih Almotlek û Osame Alnucêfî û Zafir Alanî û Tariq Alhaşimî qet qebûl nakin, anku baş ewe vegerîn aliyê erebêt Şie mezheb çunkî her çewabe dewin neku mastê jehirkirî ne û min wek kesek kurd hiç bawerî bi erebên Sune mezheb nîne çunkî hatîne cerbandin û kurdan ezmûneka tehil bi wanra heye. eve tenê ji bo bîr anîn û zanîna rayedarên kurdan..

Navê Kerkûk di mêjûyê da

B.Î. DEHLENÊWÎ

Bêguman Kerkûk yek ji bajêrên kurdî yên dêrîne, mêjûya danana evî bajêrî bo berî zayînî dizivrîteve, û yeke ji giringtirîn bajêrên Kurdistanê jî layê aburî û îstiratîjî ve, lewra jî ev çende bûye palderek ku hêrişên dujmnan bikêm û zorî berev evê deverê ve hatîne û dihên, û bûye cihê hevrikiya îmbiratoriyetên kevin, wek îmbiratoriyetên Bablî û Aşurî û Mîdî, di serdemê îmbiratoriyetên navbirî da Kerkûk gorepana cengî bû dinavbera wan da, û li ser demê nû wek her du îmbiratoriyetên Usmanî û Sefewî, û hêrişên welatên hevçerix wek evro em dibînin nexasime piştî salên dinavbera 1923 -1927-ê da, ku divî maweyda Gaz lê hatye dîtin, û roj bo rojê kêşa Kerkûk aloztir lêdihêt. Gelek bîr û boçun derbarey navê Kerkûk hene û ev nave li gor kuçkirina xelkî bo wê deverê hatye guhartin, dijêderekîda hatye ku bi şêweyekê aşkera amaje bi bajêrê Kerkûk ditêkistên Mîxî da hatye kirin, ku dizivrineve bo serdemê Ekedî yan, wesan diyardibe ku Lulubiyan bajêrê navbirî ava kiriye, wekû ya çespayî dimêjûyê xurêda li deverên Kerkûk û dewrûberbûn li hizara du û yekê berî zayînê, diwî serdemîda Kerkûk bi du nava dihate navkirin, ewjî: Erabxa û Îlanî, wate bajêrê xudawendan, lê dijêderekê dî da hatiye; hindek belge wê çendê nîşan diden ku ya dirust ewe Kutiyan bajêrê Kerkûk danaye, ewji bipal piştiya (Enoyclopaedia of Islam) ku dibêje; nikrandinên erkolociyan wesan diyardiken, ku bajêrek hebû binavê Erebxa, yan Erenca, yan Erfa, û her yek ji cad (S.H.Gadid) û sidinî simît (Sidney Smith) wesan diyardiken, ku Kerkûka niha ewe ya digutê: Erbxa, herwesan di jêderên aramîda binavê (Kirxa-Di-Bît Silox) hatye, wate; bajêrê Siloqiya, di serdemê Sasaniyan da digutê; Germekan (GARMAKAN), wate; cihê gerim, taku niha vî navî dibêjine devera Germiyan. herwesan Babilyan digute Kerkûk; Amince û Aşuriyan digutê; (Erinca–Eribha–Arafe–Araba–Arapa), û di hindek jêderên Exirîqîda hatye; Arabîxus û Bîlîmus digutê; Kurkura. herwesan demê mêjûnivîsê Yunanî yê kevin Bilu Tarx behsê hêrişên eskenderê mezin dike li sala 331-ê P.Z, navê (Arabxî–Arabxa (Îrife))-Erbaxî) li şûna navê Kerkûk bikar dîne.

Di jêderên Siryanî da Kerkûk binavê Bîp girme (Beth Garme) hatye niyasîn, her ewan jêderan digute Kerkûk; Kirxadî bîp silux (Karkha de Beth Selokh). herwesan di jêderên erebî da jî navekê taybet bo Kerkûk danaye, wekû dipirtûka (Mucim Albildan) da ya xudanê wê (Yaqut Alhemuy) hatye Kirxînî, û di jêderekê dî yê erebîda (Alhewadis Elcamiye) hatiye (Kirxîtî), her heman nav (Kirxîn-Kirxîtî) li ser demê Mexoliyan da jî dihatine bikarînan.

Di mêjûya Kerkûka kevin da gelek nav hatîne bikarînan, taku evro bûye Kerkûk, ew nave jî wekû (Kirkînî, Kirix, Kirik Silux, Kirik Siloq, Kurkure, Girgir... htd), piç pîçe geşe kir, taku bûye Kerkûk, derbarey navê Kerkûk wate ku bi Kerkûk hatye navkirin du boçun hene, ya yekê navê Kerkûk dizivrînîte ser demê dewleta Qereqînlu, wate dibêje; Yekem car ev bajêre Kerkûk li ser demî çi dewleta Qereqînlu bi Kerkûk hatye niyasîn, û ev nave ji peyiva Kirik hatye wergirtin, wate; ciwanî di Turkiya kevin da. Belê sê jêderên dî wesan diyardiken ku navê niha yê Kerkûk yekem car ji layê Elî Alyezîdî di pirtûka (Zefer name) da hatye bikarînan, ew jî li sedê pazdê zayînî. herwesan nasnavek bo Kerkûk hatye danan li sala 1947-ê, ew jî digute Kerkûk; Bîka Kurdistanê ew jî ji ber hindê ku bajêrekê Kurdistaniye, wate; kurd û ereb û turkman û aşurî û...hwd bi hevira bi birayînî têda dijîn. Paşan di şoreşa Eylulê da nasnavê Kerkûk dibe.

Dilê Kurdistanê û ev nasnave ji layê babê ruhî yê netewê kurd Mela Mistefa Barzanî ve hatbû danan, taku evroke jî her navê Kerkûk dilê Kurdistanê ye û çi ceste jî bêy dil najîn, lewra jî dest ji Kerkûk nahête berdan û çi navên dîtir bo nimune, (Temîm)çi dujminekî yan her layenekê nekurd bi mebesta erebkirinê, yan berzekirina nasnameya bajêrê Kerkûkê, yan bo her egerek û mebesteka dîtir bo Kerkûk danabe, ji layê gelê kurd ve nehatine pesendkirin û nahêne pesendkirin jî, û dê bajêrê Kerkûk mîne dilê Kurdistanê hindî gelê kurd mabe..

HÊZAXÊZ



Elektrîk şok bo rêberên me..! a

BÊKES TÊLO

Dem nîvro ye...! guman nakim ku min têla dest li mal jibîrnekir ye .Ez ji mal pir dûr bûm û min nikarîbû vegerim mal ,karekî minî taybet hebû .Sawek hesterî xwe avet min ,ez ketim nav deryakî ji pirs û ramanan bûm û bi gelek tiştên din.Ger li kar pirsa min kirin ...û ger li min geriyan û têlêfon ji min re vekirin û bê bersiv man ? ger dûrî ji van deran be ,ne başîk li min qewimî... ger û ger...gelek ji van geran di nava min de çûn û hatin .Tu ji xwe re le minêr e weqas biçûk e, mirov bi bandora wê hest dibe.Ez bê çar ê mam û min xwe avêt kolaba têlêfonê ku li ser sikak ê bû, bo çend hejmaran têlêxim û bibêjim wan çi hatiye bi serê min û ger ez pêwîst bûm bo tiştekî bela li vê hejmarê xin ,min têlêfona hevalêkî bi min re bû ,min dixest bêjim .lê hejmar çiqase ez nizanim û ev bi xwe pirsgirêkeke bi xweyî .

Berê ku em xwedî van têlên dest bin ,me hejmaran ezber dikirin lê niha ta hejmara têlêfona xwe jî nayê bîra me.Ma hûn nabînin ku ev têladest ne tenê bo axaftinê ye,bûye tiştê herî giring di jiyana me de,tijî agahdariyên giran û bûhane wek hejmara bank ,kompanî û navnîşanên ku bo te pewîst in.Min ji hevalên xwe re şîrovekir rewşa xwe ,kes nema û tênegihîşt çimkî wan jî di ve ezmûnê de derbas bûbûn, ne tu bi tenê jibîr dikî, min ji xwe re got.Me hewl da xwe bîranînên bûhirî bînin hişê xwe, bê jiyana me çawa bû pêş afirandina vê mekinê.Û em ketin nav pirsan û sergejiyan wan bo mirov ta gihan rojên bûhirî yên nêzîk .Ez ê bînim bîra we hin ji wan : tê bîra we çawa em dijiyan bê air coundition di wê kelkela germa Qamişlo de?.

Tê bîra we em li Qamişlo bê têlêfon bûn, ji bilî hin malpatan pêve ku li ba wan hebû?tê bîra we TV a reş û sipî di dikana wênekêş Zeya ye Aşorî de û em zarokên pêşeroj li ser kolanê me TV temaşe dikir dema ji dibistanê dihatin mal ku di vêtrîna dikanê de bû?.Tê bîra we çawa FAX derbasî jiyana me bû ?,me qîrand ji kefxweşiyê û matmayî man ji afirandina mirov ,ev tev hatin bîra me.Giringdana bo van tiştan ne ku ji ber rojên dûr in ,lê ji ber ku dem zû derbas bû.Û bi rastî pir seyr e, ew ê bersiva bavpirên me çi be jibo têla destan ?. Ma nayê bîra we berê 20 -30salan digotin ew ê rojek be ku nevyên me (mebseta wan em bûn) di qotîkekê bifirin ji deryayek bo deryakî din û ew ê wêneyên xwe bo me rêkin ,ji wan nîviskar ,nexweşzan û ramyar derkevin û pirsgirêka me bigihîn in cîhanê?. Rojek di jiyana me de bê têla destan em nikarin bijîn ,ji ramyarên me pêve ewan karin bi sedan sal dûrî wê bin,jê dilerizin çimkî dem wan derbas dike û wan li paş xwe dihêle.Min mînakek herî biçûk anî ku tu mirov di jiyana nûdem de nikare xwe ji têla destan dûrxe,gelo rêber in me çawa karin weqas dem bibhûrîn in be avakirina lêvegera kurdî ? ,an dîwana kurd ev nav pak û xweştir dibînim .Çawa Karin bijîn ku xakek û gelê wê tenê bihêlin nav meraqa pêşerojê de ?,di demekê de ku hawîr dorê tev têguherandin,min guherînek biçûk di jiyana me de nîşan kir ku bê wê em nikarin jiyana nûdem berdewam bikin.Na ! nabe em bê deng bimînin û nebêjin bi can û mal gelê kurd li hêviya dan û stendinên diyaloga ramyarên me ne bo dîwan kûrdî avebikin û karekî bi berpirsyariyeke mezin kar û barê xwe li hev dabeş bikin û xwedî istratîjîyek diyar û zeal pêşkeşî gelê xwe bikin. Ez di wê baweriye de me ku reberên me şok elektrîk ji wan re pêwîste bo hişê wan bi zîvire ber ve qonaxa pir hestiyar bo pirsa me ya netewî, her kêlîk dibe guherîn çêbibe. Lewra pêdiviyên karê rexistinî divêt ,amadekirina kadroyên hêja di her warî de,guhertina hin tektîkyên kevin bo bibe fişar ser desthilatê .Pir bixwaze bo aramnca xwe bidestxî bi wateya ku daxwazên îroynî ye tevgerê ku herî mafên kêm e ji bo destxistina wan divêt daxwaziyên mezin bikî û w..d..gotina Eduardo Galeano bo hemû rexên tevgera me dimeşe û di dawiyê de wek Niviskarê Îngilîzî Şekispîr dibêje : TO BE OR NOT TO BE .(tu hebî an tune bî).:

www.arsiv.kurdi.org

Çend Diyarbekîr hene?!...

Serhad B.RÊNAS

Amed îro di warên sîyaset, çand û huner, bajarvanî, nifûs, medya û aborî de bajarê herî girîng a Kurdan e. Amed bi navê xwe yê din ku di nava gel de zêdetir tê naskirin Dîyarbekîr... Amed ji bo Kurdan bê gûman xwedî girîngiyeke stratejîk û girîngiyeke hestî jî ye.Lê her alî li gor xwe Amedek dibîne û pêk anîna "Diyarbekîra xwe" hewl dide. Ev yek jî dibe sedem ku em behsa ji yekî zêdetir Amedan bikin.Li ser diroka Dîyarbekîrê gellek tişt bi Kurdî û Tirkî hatine nivisandin û lêkolînên cûda hatine pêk anîn. Bi taybetî bi dîroka xwe ya kevnar û qedîm bi sedan salane balê herkesî li ser vî bajarî bûye. Ji bo dîroka nêz ya Kurdan ji Serhildana Şêx Saîd heta mala Cemîl Paşayê û ta roja me ji bo Kurdan bûye cihekî girîng û navendî. Îro Diyarbekîr xwedî serjimara (nifûs) giştî nêzî 1 milyon 800 hezar e. Nifûsa fermî ji nifûsa heyî kêmtir e. Him problemên di jimartinê de û him jî girseya ku ne li nifûsê ne qeyd kiîne û her wiha dewleta Tirk ji bo ku razemendî bo Dîyarbekîr kêmtir biçe hewla dewleta Tirk bo kêm nîşan dayîna nifûsê heye. Bi vê hejmarê xûya dibe ku Diyarbekîr

- li bakûrê Kurdistanê bajarê herî mezin e.
- li hemû Kurdistana mezin piştî Silêmanî û Hewlêrê bajarê 3'yemîn e.
- li nav sînorên fermî a komara Tirkîyeyê bajarê 6.emîn a herî qelebalix e.

Li navenda Diyarbekîrê em dikarîn bibêjin ku Diyarbekîrî pirr kêm in. Li Amedê nifûseke zêde a Mêrdîn û Bingoliyan heye. Her wiha nifûseke mezin jî ji navçeyên Amedê û bajarên din ên Kurdan hatine û bicîh bûne.Diyarbekîr bi her avayahî ji bo kurdan navendek girîng û kelahek stratejîk e. Divê kurd bi her avahî vê kelahê xûrttir û bi hêztir bikin. Bi rexistin bûn, komale û sazî ava kirina li Amedê, xebatên şaredariya Amedê, xebatên sermayedarên Kurdpewer, xebatên medyaya Kurdî ji bo xûttir kirina vê klehayê bi girîng e.

Ji bo Kurdan û tevgera siyasiya Kurdî Dîyarbekîr

Piştî salên 80î rol û girîngiya Amedê di têkoşîna rizgariya Kurdan de zêdetir bû. Dewleta Tirk jî bo çewsandin û asîmîle kirina Amedê hewla pir mezin da û hê jî dide.Ji bo gellek Kurdên dervey Amedê navê Amed xwedî wateyeke mezin û romantîk e. Kesên dervey Amedê di xeyalên xwe de wek bajarekî ku herkes girêdayî Kurdeyatî ye û bi zimanê Kurdî tê axaftin difikirin. Lê rastî de rewş cûda ye.Di hin bajarên Kurdan de asîmîlasyona siyasî pir pêş de û hin bajarên Kurdan de asîmîlasyona çandî pêş de ye û hin bajarên Kurdan de jî her du jî pêş de ye. Li Amedê bi hewlên dewleta Tirk û ji ber cihê xwe yê coxrafik a bajêr asîmîlasyona çandî-zimanî pirr pêşketiye. Lê berovajî vê yekê li Amedê asîmîlasyona polîtîk pirr kêm e û ya heyî jî sal sal kêmtir dibe. Li aliyekî din de jî asîmîlasyona çandî jî pirr hêdî be jî ber bi kêm bûnê ve diçe. Amed îro di warên siyaset, çand û huner, bajarvanî, nifûs, medya û aborî de bajarê herî girîng a Kurdan e.

Çend sedemên navend bûna Amedê jî bo Kurdan;-Ne bi avayekî fermî be jî di rewşa fiilî de navêndên partiyên siyasî ên Kurdan wek DTP (BDP), KCD, HAK-PAR, KADEP, TEVKURD li Amedê ne.-Navêndên gellek weşanên medyaya Kurdî li Amedê ne. Wek rojnameya Azadiya Welat, Rojnameya Dema nû, Dîha, HAWAR NET, kovarên wek Bîr, Nûbihar, Kovara W, Tîroj, Mizgîn, Çirûsk, Kelha Amedê, TevKurd, Demokrat, Tîgrîs, Roja Kurd û gellek weşanên din li Amedê ne. Her wiha gellek weşanên herêmî jî weşanê dikin. (Wek Gun TV û radyo)

- Li Amedê gellek çalakiyên çandî û hunerî tê pêk anîn. Amed wek navenda çand û hûnerê ya bakûrê Kurdistanê ye. Bi taybetî Festîvala Çand û Huner a Amedê ku ji aliyê şaredariya Amedê ve tê pêk anîn xwedî bandoreke mezin a ser çand û hûnera li Amedê ye.
- Şaredariya Amedê û navçeyên wê di destê Kurdan de ye û şaredariya navendiya Amedê şaredariyeke xûrt û çalak e. Heta bandora xebatên şaredariya Amedê li ser şaredariyên din ên Kurdan jî hene. Park û seyrangehên mezin li Amedê hene. -Cejna neteweyîya Kurdan herî zêde li Amedê bi avayekî girseyî tê pîroz kirin.
- Amed di raya giştî ya navnetweyî de wek navenda Kurdan tê naskirin û bala medyaya cîhanê jî ser Amedê ye. Ev Dîyarbekîr zêdetirr taxên Baxlar, Kayapinar, Sûrîçî digre navxwe bi aybetî di nav malan de axaftina bi Kurdî pêş de ye. Taxên han zêdetir piştî vala kirina gûndên Kurdên koçber bûyî çêbûye. Dîyarbekîr zêdetir Amed e.

Dîyarbekîra nîv-Kurd û nîv-Tirkan / Fettullahçiyan

Piştî Diyarbekîra Kurdan Diyarbekûrek din jî heye ku ji aliyê kesên ku ji bo pêşeroja Kurdan û hedefa Kurdan bi riya hewlên ne-dîrek ya dewleta Tirk bihêz dibin tê pêşxistin. Di vê Diyarbekîrê cemmata Fettullah gulen û çend cemaatên din serdestin û bi avayekî berfireh xwe birêxistin kirine û bi malên xwendekaran, bi yûrdan, bi dibistanan, bi marketan, bi dikkanan, bi pirtûkfiroşan, bi komaleyên xwe li her derê Diyarbekîrê wek vîrûsa nexweşiyeke xirab belav bûne. Cemaata Fettulah Gulen bi taybetî kesên nîv asîmîle bûyî, di nava olperestan (ne oldar) û di nava girseyên ku bi taybetî eslê wan Bingol û bajarên din e û li Diyarbekir bi deh salên berê bi cih bûne û bi piranî bi esnafî re mijûlin (ku ji bo wan şikestina camê dikanên wan ji rûmet û azadiya netewa wan girîngtir e) xwe bi taybetî bi riya komaleyan û bi rojnameya Zaman û Samanyolu TV birêxistin kiriye. Xetera "vê Diyarbekîrê" ji bo kurdan herî kêm bi qasê xetera artêş û dezgehên dagirkeriyê ya dewleta Tirk mezin e û armanca Fettuulah Gulen eve ku Tirkçitiyê bi riya dînî li Diyarbekîrê belav bike..

Dîyarbekîra dewleta Tirk û "Tirkî"

Li Diyarbekîrê "Diyarbakir"ek jî heye. Di vê "Diyarbakir"ê Tirkên ku ji hêla Tirkiye ji bp wezifeyê û ji bo kar hatine, memûrên dagirkeriyê ya dewleta Tirk, leşker û polîsan û malbatên wan û Kurdên ku bi temamî asîmîle bûnê û jiyanek bi Tirkî û xwedî fikrên Tirkî ne dijîn.

Di vê "Diyarbakir"ê de her tişt li gor daxwaz û armancên dewleta Tirk dimeşe. Ziman temamî Tirkî ye. Kesên ji vê beşê li kolan û kûçeyan de nînin. Li mal Û lokalên xwe an jî çend navendên danûstandinê de ji xwe re "Tirkiye"ya xwe ya biçûk çêkirine û di nava wê dijîn. Mûzîka Tirkî guhdarî dikin, ji bo maçên tîma Tirkiyeyê pîrozbahiyan pêk tînin. Di rojên "fermî" ya dewleta Tirk de pîrozbahiya "serkeftinên" xwe dikin. Û Kurdên dejenere û binketî li dûvên wan digerin.

serhadbrenas@yahoo.com

Esas "nankor" hûn in

ZINARÊ XAMO

Serokwezîr Erdogan, di civîna gurûba partiya xwe da li ser derbasnebûna madeya 8-a ya qanûna esasî û dengnedana BDP-ê ya vê madeyê rawestiyaye û rexneyên gelkî giran li BDP-ê girtiye.Lê di eynî wextê da Erdogan, xwe daye dest jî, nêt û dîtina wî ya xerab ya derbarê mesela kurd da jî careke din eşkere bûye.Di civîna meclîsa Tirkiyê ya do, di tûra duyem da madeya 8-a ya destûra esasî ku bi vê madeyê girtina partiyan li gor nuha zahmettir dibû, ji meclîsê derbas nebû, tenê 327 ray girt û loma jî nehat qebûlkirin.Heger BDP têketa civînê û dengê xwe bi şiklekî "erê" bida pêşniyara AKP-ê, ev made ewê bihata qebûlkirin.Lê mixabin BDP neket dengdanê û ev made ji meclîsê derbas nebû.Gelek derûdor, sûcê vê "têkçûna" AKP-ê dixin hustuyê BDP-ê. Rast e, di vê netîceyê da para BDP-ê jî heye. Bi ya min jî ne tevayiya destûrê, lê dibê deng bida vê madeyê. Lê sûcê AKP-ê jî yê BDP-ê pirtir e, ew jî ji kurdan ra dibêjin "mêrikê me uncûrê tahl e, hûn dixwin jî ev e, naxwin jî ev e." Dibê meriv vî aliyê meselê jî bibîbe.Esas hejmara AKP-ê tenê jî têr dikir, lê di vê dengdanê da ji AKP-ê li dora 11-12 kesan dengê "erê" nedana vê madeyê.Netîce, bi mixalefeta BDP-ê û alîkariya 12 zilamên dewleta kûr yên di nava AKP-ê da ev made nehat qebûlkirin.Tiştekî pir vekirîye, ev destûra ku AKP-ê amade kiriye tu mafekî netewî nade miletê kurd, hebûna kurdan qebûl nake, zimanê kurdî serbest nake, ev hemû rast in...Yanî meriv dikane bibêje ku destûra nuh bi giştî ji bo kurdan tu tiştekî girîng îhtîwa nake û nayne, înkara miletê kurd her berdewam e...Lê li gel vê jî bi baweriya min dibê BDP-ê biştgirî bida hin madeyên destûrê, bi kêmanî madeya 8-a ku girtina partiyan zehmnettir dike.Belkî hin madeyên din jî hebin, lê ez nizanim...Wekî din jî, serokwezîr Erdogan, di axaftina xwe da bi uslûba axayekî xwedîxêr peyivîye û parlamenterên BDP-ê bi "nankoriyê" îtham kirye, gotiye."Li vî welatî TRT6 hate vekirin, nankoriyê nekin. Heger tu dixwazî zimanê diya xwe fêr bibî, îktîdarek heye ku ji te ra dibêje, qursa xwe veke û zimanê xwe fêr bibe."Tu dibêjî qey mêrik xêr û sedaqa serê bavê xwe daye kurdan û loma jî dibê BDP û kurd tim jê ra minetdar bin û tu carî bêemriya wî nekin... Û ji ber ku parlamenterên BDP-ê, ev xêr û çêyiya wî ji bîr kirine, lema ew jî vê "xêr û sedeqa serê bavê xwe" li BDP-ê û ji kurdan ra dike serhevde.Birêz Erdogan, kesî TRT6 bi xêra bavê xwe nedeya kurdan, kurdan bi têkoşîna salan û xwîna xwe ev maf girtiye.Heger te û dewletê, we bizaniîbûya ku nedan ji we ra baştir e, welehî we bilehî we zirnîq jî nedida kurdan, bira vekirina TRT6-ê li wir bimîne, we nedihişt stranek kurdî jî di TRT-ê da were gotin.Lê li gor hesab û kitabê we, we ev rê ji bo dewleta xwe baştir û bixêrtir dît, loma we TRT6 vekir, ne ku dilê we bi kurdan şewitî, hûn li kurdan hatin rahmê ya jî bi rastî we dev ji nêt û plana xwe ya tunekirina kurdan berdaye.Kurd vê yekê dizanbin û dibînin.Heger bi rastî jî nêta te pir paqij bûye û te bixwesta mesela kurd çareser bikire, te yê ev yek têkira destûrê û baniya meclîsê.Te navê kurd nekirye destûrê, tu qala "nankoriyê" dikî.Esas "nankorên" herî mezin hûn in, ji ber ku kurdan 75 parlamenter dane we, lê li gel vê jî hûn perwerdeya zimanê kurdî li zarokên wan zêde dibînin.Ma ev ne bêûjdanî û nankorî ye? Ya din, bi van gotinên Erdogan jî meriv dibîne ku di serê wî da çi heye û ji bo kurdan maf û çareseriyeke çawa difikire..."Heger tu dixwazî zimanê diya xwe fêr bibî, qursa xwe veke û zimaê xwe fêr bibe"!Camêr çi biaqil û çi çavê diya xwe ye, "qursa xwe veke û zimanê diya xwe fêr bibe..."Eynî wekî etarekî dimsoyî peyivîye, "bide perê xwe, bigre dimsê xwe..."Ê heger meriv bi qursê zimanê diya xwe fêr dibe, wê demê çima tu ji zarokên tirk ra qursan venakî?Ev gotin bi serê xwe tenê him dîtina Erdogan ya derbarê çareseriya mesela kurd da nîşan dide û him jî heqareteke li miletê kurd e. Miletek çawa dikane bi qursan zimanê xwe fêr bibe? Ev pêkenîna bi miletê kurd e...Dewleta we welatê kurdan dagîr kiriye û kurd jî ji hemû mafên wan yên netewî pêpar hîştiye, hûn rejîmeke hewqasî bêûjdan û bêmerhemet in ku, hûn nahêlin zarokên kurd bi zimanê xwe jî bixwînin. Li ku dera dinê hatiye dîtin ku zarokên miletekî li welatê xwe bi peran, di qursan da zimanê xwe fêr dibin?

Hikûmeta Sûriye, kurdan ji axa wan derdixe

SERCAN MEHMÛD

(Deshlata Sûriya bi biriyara hejmara (2707) ya wezareta çandiniyê bi yek alî dest datîne ser mal û zevî yên 1152 malbatên kurd yên ser bi bajarê Dêrikê û armanc ewe ku kurdan ji cih û warên wan derxînin û di cihên wan de erebên şofinî bicih bikin, heta niha hikûmeta Sûriya piraniya kurdên li devera Dêrikê wek welatihiyê xwe qebul nake û wek penaber danûstanê di gel wan da dike.Hecî Ehmed yek ji xelkê Dêrikê ji gundekî ser bi Dêrikê ve taybet ji bo Evro diyar kir ku hikûmeta Sûriya bi armanca ku em gund û bajarê xwe bicih bihêlin birar daye ku dest deyne ser hemû zeviyên di destê 1152 malbatên li gundên Dêrikê û di cihê wan de jî dê ji başûrê Sûriya erebên şofinî bicih bike û got: (em wek kurdên devera Dêrika hemû bi hîç rengekî biriyara hikûmeta Sûriya qebul nakin û em cih û warên xwe bicih nahêlin.Li aliyê din welatyê binavê Ebo Cihad jî, ji gundê Şirikê taybet ji bo Evro diyar kir ku du roj berê navê 452 malan hatibû ku erdên wan ji wan bihête stendin û roja 10/4/2010 jî navê 700 malbatên din jî, ji aliyê hikûmeta Sûriya ve hate aşkere kirin ku zeviyên xwe bicih bihêlin û hejmar niha gihiştiye 1152 malbatan û got: (em bi hîç rengekî biriyara hikûmeta Sûriya qebul nakin û ji bo betalkirina biriyara wezareta çandiniyê çi ji destê me were emê bikinEbo Cîhad her wesa diyar kir ku ew zeviyên ku wezareta çandiniyê dixwaze ji wan werbigire bi deh salane ji aliyê gelê kurd ve dihête çandin û jiyana xelkê deverê li ser çandiniyê ye û got: (di biriyara wezareta çandiniya Sûriya de bihina şofiniyê dihê û em ne berhevin zeviyên xwe ji hikûmetê ra bihêlin û ji bo betalkirina biriyarê çi ji destê me were emê bikin.

Li aliyê din Mistefa Îbrahîm berpirsê nivîsîngeha partiya dîmokirata kurd li Sûriya (el partî) li Hewlerê di vê derbareyê da taybet ji bo Evro diyar kir ku ev karê ku hikûmeta Sûriya li bajêrê Dêrikê dike bi salane berdewam dike û got: (em biriyara hikûmeta Sûriya qebul nakin û emê nerazîbunên xwe jî di vê derbarê de diyar bikin.

Ehmed Mistefa Xelef endamê partiya yekîtiya dîmokirat li Sûriya (Pyd) jî taybet ji bo Evro diyar kir ku wezareta çandiniya Sûriya ji bo armancên xwe yên kirêt dixwaze rewşa xelkê devera Dêrikê têk bide û kurdan ji cihên wan derbixe û got: (em dê ji bo ji navbirina biriyara wezareta çandiniyê Sûriya nerazîbûnên xwe bi tundî nîşan bidin û em daxwazê ji xelkê xwe jî dikin pêgiryê bi biriyara hikûmeta Sûriya nekin.

Ehmed Mistefa her wesa diyar kir ku eve ji sala 2003 ve hikûmeta Sûriya pey bi pey biriyara guherîna dîmogirafiya rojavaya Kurdistanê dide û dixwaze bi vî rengî kurdan parçe parçe bike û got: (em daxwaz ji civata navdewletî dikin ku fişarê bixe ser hikûmeta Sûriya û nehêle ku deshlata Beşer Esed mafên kurdan zêdetir binpê bike.



Kî ji yekitiya neteweyî direve?

JI DOSYEYA TAYBET A "BER BI KONFERANSA NETWEYÎ" YA HAWAR NET'Ê

Di rewşeke ku xeleka bêbextiya navneweteyî li kurdan dîsa tê tengkirin, pêwîstiya kurdan bi yekitiyeke xurt a navneteweyî heye. Lê mixabin ku heta niha di mijara Konferansa Neteweyî de tu gav nehatine avêtin. Tu ji kîjan hêza siyasî ya kurd bipirsî ew ê bi rehetî girîngiya Konferansa Neteweyî ya Kurd bîne ziman û piştgiriya xwe bi devkî diyar bike. Lê ligel vê xetereya mezin a li ber deriyê kurdan hê jî tu gavên pratîk nehatine avêtin.
Li ser nirxên nûjen, di çarçoveya nirxên demokratîk de li hemberî xetere û êrîşên ji derve ku armanca wan tunekirin û têkbirin e, yekitiya neteweyî ya gelê kurd bê parastin. Li hemberî xetereyên tunekirin û parçekerinê ev, divê têgeha 'yekitiyê' bê pêşxistin. Nabe ku ev yek bibe eger û sedema nijdaperestiyeke paşvrû.
Mirov bi rehetî dikare bêje ku di vir de nexweşiyeke nebaş a wekî neteweperestî tune ye û armanca esasî parastin e. Mirov bi gotineke din dikare bêje ya gelê kurd dike ne 'nijadperestî'; 'neteweparêzî' ye.
Di yekitiya demokratîk a gelê kurd de rola pêşengiyê ya hêzên siyasî yên mezin e ku kadro û xebatên wan li çar parçeyên Kurdistanê ne. Mijara esasî ya bê nîqaşkirin ew e ka çima hin hêz xwe nadin ber Konferansa Yekitiyê û çima bêdeng dimînin? Heke bersiv ji van pirsan re bê dayîn bawer dikim ku dê rastiya hêzên ne alîgir jî çêtir bê zanîn.Yên ku naxwazin ji du sedeman dikarin nexwazin. Sedema yekemîn dibe ku tirsa ji serdest û desthilatdarên Kurdistanê be. Ev sedem her çiqas neyê qebûlkirin jî dema hovîtiya serdestan li ber çavan tê girtin heta dereceyekê dikare bê fêmkirin. Ango ev sedema ku dibe asteng ji derveyî îradeya hêzên kurd hatiye afirandin û riya şikandina vê yekê jî bêguman dîsa 'Yekitiya Neteweyî' ye.Sedema duyemîn a ku hêzeke siyasî ya kurd li dijî Konferansa Neteweyî derkeve ew e ku ew hêz ne ji bo berjewendiyên gelê kurd û doza azadiya gelê kurd hatiye avakirin e. Ango heke hêzeke siyasî ya kurd ji bilî sedema yekemîn li dijî yekitiya neteweyî derkeve, bi tenê sedemek dimîne ku ew ne ji bo xêr û bêra kurdan têdikoşe.

Ji bo çi yekitî?

Li Başûr heke dubendî di nava hêzên siyasî de nebûya û hemû li gorî berjewendiyên gelê kurd tevbigeriyan, nedibû ku parçeyên din kiriban qurban. Li Bakur heke kurdên bûne-'qewmê kewê' hêviyê nedin serdestan ne mimkûn e ku neçareseriya pirsgirêkê ev qas dirêj bikira.Li Rojhilat heke hemû hêzan pişta xwe daba hev û li dijî rejîma zalim têkoşîn bimeşanda niha rewş ne ev bû. Heke ku li Sûriyeyê her malbatekê partiyek venekira, dê çima têkoşîna azadiya kurd li wî parçeyî wisa qels bûya?Di vê pêvajoya krîtîk de yekitiya kurdan bi qasî pêşvekirina hêza gelê kurd dê bandoreke gelek erênî li ser têkiliyan kurdan ên bi ereb, tirk û farisan re jî bike. Divê neyê jibîrkirin ku felsefeya serdesta ev e; 'Kurmê darê ne ji darê be, zewal li darê nabe." Bingeha konferanseke neteweyî ber bi avabûnê ve diçe û divê hewldanên KNK'ê yên dawî girîng û hêja bên binavkirin.

TAYYÎP TEMEL

Konferansa Neteweyî û Pêwîstiya Stratejiyeke Nû

Li Beriya viya demekê KNKê jî dawa lidarxistina konferaseke neteweyî kiribû. Bi her hal ev fikrekî baş e û di dîroka Kurdistanê de yekem car bi aşkerayê, dê civîneke wisa bê çêkirin. Bê ku ez bikevim nav xirecira vê konferansê, ez dixwazim di vê mijarê de hin tiştan bibêjim.Tu devê kîjan welatparêzekî Kurd vekî, dê bibêje Kurdistan çar parçe ye, hemû dijminên me li ser lêdana me di peywendiyê de ne, her çar aliyê me dijmin in û her wisa...heta Amerîka û Ewrûpa jî alîkariya dijminên me dikin. Ev tev rast in, lê di xebata siyasî de ev gotar ber çi digire. Rast e, wek fikir nav gelê me de bê zanîn û hesta wan a niştimanperweriyê hişyar bimîne baş e û ji xwe divê wisa be jî. Lê wekî min got di xebata siyasî de tim û daîm gotina vê rastiyê tu feydeyekê nagîhîjine me. Ji ber wî divê em riya aqil û mantiq bidin ber xwe ta ku em bi vê gotara xwe ya bêperwa hemû dijberê xwe nekin hevalbend.Di kaînatê de pêşketin tedrîcî û qonax bi qonax pêk tê. Dema em bibêjin em ê hemû dijberê xwe carekê de têk bibin, ev dibe xewn û xeyal. Ji ber wî jî divê em nexşeyeke azadî û serxwebûnê bidin ber xwe ku serkeftina me di paşerojê de mîsoger bibe.
Pêwistiya viya jî bi hişekî hevpar û bi ditineke dûr û kûr heye. Bo nimûne em heta pêşhatên dunyayê baş nexwînin û em dîroka siyasetê baş nenirxînin, em nikarin gaveke hişmendane bavêjin. Ji bo wî di vê konferansê de û ji bilî
konferansê jî ronakbîrên kurd divê vê analîzê baş bikin. Dema em bi hêzên lokomotîf ên cîhanê re rêknekevin, em nikarin doza xwe pêş de bibin. Rast e êş û azarên mezin miletek ber bi fikra azadî û serxwebûnê ve dibe lê viya ji bo serkeftinê têrê nake. Bo nimûne tevkujiya Helepçeyê û enfalê gelê me yê Başûr hişyar kir şiûreke neteweyî li ba wan peyda kir. Lê serkeftin pişti van bûyeran pêk nehat. Çend sal paşê dema şerê Kendavê ku Amerîkayê êrîşê Îraqê kir, rejima Sedam meşrûiyeta xwe ya navneteweyî winda kir, hêza wî şikiya bi piştgiriya hêzên serekeyên cîhanê Kurdan di serhildaneke nimûneyî de karibûn li perçeyek welatê me herêmeke federal rabigîhînin. Yanê ku şertên navneteweyî destûr nedana Kurdên me yên Başûr, ew nedigîhîştin qonaxa îro. Ji ber wî tehlîla siyaseta navneteweyî û tespîtên li ciyê xwe hêza gelê me geştir dike.Ya diduyan divê em li ser herêma Rojhilata navîn û welatên cîran û cîhana İslamî jî heman analîz bikin. Lewra em nikarin di deryayeke dijber de bijîn. Em nikarin bi her kesî re şer bikin. Ew welatên cîran ên dijber ku xirecira me bi wan re heye eger di nav sîstema hêzên Rojavayî de bin xebat bi awayekî dimeşe, ku di nav vê sîstema hêzên sereke de nebin heta li dijî vê sîstemê bin xebat bi awayekî tir dimeşe. Lewra çaya kelandî mîna ava sar di firekê de nayê vexwarin. Qasê ku ez dibînim hêzên Kurdî hêja li ser viya cidî nexebitîne. Mamela bi Tirkiyeyê û ya bi Îranê û Sûriyeyê yek nabe. Her welat xwedî taybetmendiya xwe ye. Lewra her perçeyên Kurdistanê ji hêla siyasî de xwedî taybetmendiyeke cihê ye. Ji ber wî jî carekê de bi herkesî re şerkirin tiştekî bi destê me ve nayîne. Beravajî bi sedan alî de van dewletan xwedî fikrên cihê berjewendiyên cihê û perspektifên cihê ne. Dema em bi bêperwayî tevdigerin, ew li ser berjewendiyên xwe yên hevpar tên ba hev û
li me didin. Di vê diyardeyê de para me jî heye. Lewra xebatên me divê wan ji hev dûr bixe, ne ku wan bîne ba hev û bibe sedemê êrîşkirina me.Ya sisêyan karê me yê navxwe û xurtkirina nasnameya Kurdî ye. Kî dibêje çi bila bibêje, me heta niha bi awayê ku tê hêvîkirin xebata vejandina nasnameya neteweyînekiriye.Hêmayên neteweperweriyê li ba me gelek qels in. Bi taybetî jî li Bakur ev gelekî xuyaye. Hêmayên neteweperweriyê ku ax, ziman, ala û sirûd in, li ba me nebûne diyarde. Bo nimûne hin hêzên Kurdî alaya Kurdistanê hilnakin, tenê bi alayên partiyên xwe îqtîfa dikin. Xuyaye hemû hêzên kurdî li ser alayê li hev nehatine. Divê ev bê çareserkirin ku hatiye çareserkirin divê ev hêz erkên xwe bi cî bînin.

Zilkîf XWEŞHÊVÎ

"Mafî çarenûsî ne di destê tu partiyê de tenê di destê gel de ye"

Yêkitiya rêzanî di nav partî û komelên xwedî berjewendiyên hempar û ramanên cihêreng da pêk tê. Yêkitî bê demokrasiya navxweyî pêk nayê. Mixabin îro di nav rêxistinên me yên rêzanî da demokrasiya navxweyî tune ye. Serokên partiyan çi bibêbjin ew pêk tê. Ji aliyê din ve pirraniya partiyên me bi awayekî gelekî hêsan kirasê xaîntiyê li hev û din dikin, û roja din dîsa bi awayekî ewqasî hêsan hev û din bilindî asîmana dikin, hev welatparêz ilan dikin. Heke em Kurd bi rastî dixwazin bi hev ra yêkitiyê çêbikin divê em berî her tiştî dev ji vê nêrîta xwe ya sosret berbidin û têkiliyên navxweyî li ser pîvanên demokrasiya hemdem a rojavayî ava bikin. Çawa ku di nav hemî netewên dunyayê da partî û komelên xwedî bîr û baweriyên ji hev cihê hene, di nav me Kurdan da jî hene. Înkar kirina rastiyan hebûna wan ji holê ranake. A grîng ew e ku li ser berjewendiyên hempar, berjewendiyên netewî, li hemberî welat û netewên naxwazin gelê me wekî gelên din ên bi rûmet jiyana xwe ya netewî, rêzanî û çandî dewam bike, bibin yek deng û yek hêz. Gelemşa me Kurdan a herî mezin ew e ku pirraniya partî û komelên me yên siyasî ne xwedî prensîb in. Ji ber ku partî û komelên heyî bi giranî partî û komelên serokan in, nikanin bersivê bidin pêdiviyên gel, û hêza wan a amadekirina şert û mercên Kurd jî mîna gelên bi rûmet ên dunyayê bi vîna xwe ya azad çarenûsa xwe diyar bikin û biryara statuya rêzaniya pê dixwazin jiyana xwe dewam bikin bidin tune ye. Divê rêxistinek bi ser partiyên siyasê yên heyî ra were avakirin û ev rêxistin li gor prensîbên gel û gerdûn bi netewên xwe vîna wan a azad dide diyarkirin gavên pêwîst bi avêje. Statuya wan a di nav partî û komelên wan da çi dibe bila bibe hîç kes, partî an jî komeleyek siyasî nikane ambargoyê dayne ser vîna azad a gel, û nikane li ser navê gel biryarên çarenûsî bide. Mafi biryarî çarenûs tenê û tenê di destê gel bi xwe da ye, ev maf bi destê tu partî, komel û endamên wan nayê bikaranîn. Hilbijartin, referandûm û serî li raya gel dayîn ji bo vê armancê hene.

Qado Şêrîn; Medyaya Kurdî dikare rola sereke bileyze

Yekbûna Kurdan... Ji bo ku kurd bikaribin xwe ji ber êrîşên dujminan biparêzin û wek yek mileti ko li se xaka xwe dijî, ji bo ko hestê netewî li ba hemû kurdan yek be. Ji bo ku dujminên kurdan nema bikaribin kurdan tune bikin, bi gumana min ji me hemiyan tê xwestin, çi; nivîskar, rewşenbîr, siyasetvan, partî, rêxistin, partî, komele, kes û mirovên kurd sê şert û mercan bi cih bînin: ji hev hez kirin-hev pejirandin û li hev guhdarî kirin. Mixabin ku kurd bi jimara partî û serokan perçe bûne. Mixabin ko gelek kes partî û serokê partiya xwe ji Kurdistanê bêtir diparêzin, ji Kudstanê bêtir ji serokê partiya xwe hez dikin û bêtir xirecirê dikin.Yek ji erkên "Konferansa Neteweyî"ye ko kurdan bi yek e, îca ji bo ko hemû kurd hest bibin ku yek in, yek milet e, divê kurd li dijî hev dernekevin, bercewendiya kurd û Kurdistanê biparêzin û di ser bercewendiya serok û partiyan re bigrin.Her wiha divê zimanê kurdî biparêzin û bikar bînin, jixwe medyaya kurd di vê çarçoveyê de dikare bi rola sereke rabe. Rola ko kurd ji hev hez bikin, ji ziman û al û tiştin din hez bikin.Li dawî axaftin, xwendin û nivîsandin û bikar anîna ziman, ziman û dîsa ziman.



Îsraîl; Îran gihêşt qonaxa çêkirina çekên nuklerî

Li gor îddayên istixbarata Îsraîlê, Îranê astengîyên teknîkî yên li pêşîya sazkirina çeka atomê derbas kiriye



(Pêşketin): Serokê beşa analîtik ya istixbarata leşkerîya Îsraîlê Yossî Beydîts diyar kir ku Îranê astengîyên tekniki yên li pêşîya sazkirina çeka atomê derbaz kirîye. Li gor gotinên Beydîts derbazbûna Îranê li ser statûya welatê atomê, pirsa çareserkirina siyasî ye. Bernama Îranê ya atomê di nav civata navnetewî da endîşeyên ciddî saz dike. Lê di dest MAGATE`yê da tu ispatiyên di wî warî da tune. Îran pêşniyara ``koma şeşan`` red dike, ku ûranyûma xwe bişîne derveyê welêt. HAWAR NET.com

Li Atînayê ji ber tedbîrên aborî gel rabû ser piyan; 3 mirî

Li paytexta Yewnanistan Atînayê, bo protestokirina daxwaza daxistina mûçeyî ya hikûmetê greva giştî pêk hat, tê de, alozî çêbûn û herî kêm 3 kesî jiyana xwe ji dest da.
Dema ku xwepêşandaran xwest bankeyekê bidin ber agir û hêzên ewlekariyê dest tê werda pêk hatin. Ekîba îtfaiyê gava xwest agirê wir vemirîne, diyar kir ku li hundir cesedê 3 kesan dîtiye. Xwepêşandaran, li kolanên Atînayê, bi molotofan bersiva bombeyên gazê yên polîsan da. Protestovan, li diji daxistina hikûmeta Yewnansitanê ku dê 110 milyar euroyê paşve bide û wê ji bacê daxe, derdikevin.

Li Efxenîstanê şer gurr dibe, DYE eskerên nû dişîne

Wezareta berevaniya Amerikayê (Pentagon) ragihand ku Washington ji bo cebirandina kêmasiya fêrkarên hêzên efganî wê 850 eskerên dinê bişîne Afganistanê.

Gelo Belçîka ber bi 2 dewletê ve diçe?

Belçîka bi demokrasiya xwe ya berfire dihat nasîn. Ancax ne valonî û ne jî flamanî ji vê razîne..

(Pêşketin) Di encama lêkolînê de derket holê ku valonî dixwazin pergala netewe-dewletê bê xurtkirin û flamanî jî piştgirî didin xurtkirina serxwebûnê
Li Belçîka yê piştî qeyrana hikûmetê, di lêkolîna rayagiştî de derket holê ku, flaman serxwebûnê û hin bêhtir otonomiyê dixwazin, valon jî, nêrîna xwe di derbarê dewleta unîter de dan diyarkirin.
Valon bi çavek sar li serxwebûnê meyzedikin. Li gorî lêkolînê ji sedê 32`ê valonan dixwazin payeyên herêman bên kêm kirin û Belçîka bibe dewleteke bihêz ya unîter. valonên ku dixwazin rewşa heyî berdewam bike, ji sedê 24'an de diminin.
Di nava valonan de kesên ku dixwazin ji herêman re bêhtir otonomî bê dayîn, ji sedê 14 ne. Yen ku destekê didin konfederasyonan jî di rêjeyek ji sedê 9`an de man. Yên ku ji bo Belçîkayê serxwebûneke tekuz dixwazin ji sedî 1 in. HAWAR NET.com

Di civînê de pevçûna Îran û Emerîkayê



(Pêşketin): Konferansa nebelavkirina çekên atomî li New Yorkê bi sûcdar kirina di navbera Emerîka û Îranê de destpêkir Serokê Îranê Ehmedînecad doza vekişandina hêzên Emerîkî ji her devereke kir , û bi bîr anî ku Emerîka yekemîn welate ,ku çekên atomî bikar anî ye. Zêde ji vê, Waşington hertim samanên xwe di warê çekên atomî de bihêz dike û forta li welatên din dixwe ,nemaza derheqa Îranê de . Ev ragihandin serokê Îranê Ahmedînecat di çarçova gotara ,ku îro pêşkêşî beşdarên sameta ne belavkirina çekên atomî kir destnîşan kir . Lê wezîra derve ya Emerîka Hêlêrî Kilinton jî di bersivdana Ahmedînecat de , daxuyanîkirin ku Îran amadeye hemû karî bike da, ku bala civata navnetewî ji ser xwe vekişîne û ji berpirsatiyê dûr bikeve. Di nerîna wê de kar û barên Îran dike , gefeke zindî liser rêjima ne belavkirina çekên atomî ye.

JI BO ZÊDETIR NÜÇEYÊN NAVNETWEYÎ hawarnet.com

Bi hezaran kesî li dij qanûna koçberiyê meşiyan

Roja yekşemê bajarên sernaserê Emerîkayê, şehedê birêveçûna xwenîşandana li dij qanûna nûye koçberiyê li Arozînayê bûn.Li vê xwenîşandanê ku ji aliyê çalakên karûbarên koçberiyê li bajarên mezine Amerîkayê ,ji wan li New Yorkê û Loss Angelessê birêveçû, beşdaran bi rakirina pankardan , pejirandina qanûna nûye koçberiyê li Eyaleta Arîzonayê ,şermezar kirin .

Îran; Emê jinên wek menkenan dimeşin bavêjin hepsê

Îranê ber bi serdema kevirê ve diçe. Li Tehranê rêvebiriya polîsan diyar kir ku keçên ku wek "manken"an dimeşin û qemirîne (bronz bûne) wê bêne girtin. Şefê polîsan diyar ki ku "Li bakûrê Tehranê jinên ji ber tavê qemirî ne an jî keçên ku wek mankenan dimeşin em dibînin. Em nikarin tehemmulî vê yekê bikin emê wana bigrin û bavêjin" zîndanê. Wek tê zanîn zilamekê olî ya îranî jî îdda kiribû ku erdhêjên li cîhanê ji ber jinên vekirî û tazî pêk tên.

Qûrbanên pêşîn kareseta li Meksîkayê



Nefta ku ji ber qezaya platforma neftê pêk hat bi hezaran giyanwerên deryayê mirin . Qezaya di platforma neftê ya şîrketa BP dibe sedema karesetake sirûştî. Her çiqas ji bo pêşî lê girtina herikîna neftê hewl tê dayîn jî her bi hezaran varîl petrol diherike nav behrê. Ev yej jî dibe seedema mirina giyanwerên di nav behrê. Wek tê zanîn li Meksikayê di sêşma bihûrî de di encama teqînek û şewatekê de platformeke mezin a petrolê hilweşiya bû. Piştî bûyerê ji platformê neft li derdorê û deryayê diherike û ger neyê sekinin wê yek ji mezintirîn kareseta sirûştî ya Emerîkayê be.



Zewaca çewt dawiyê li jiyana cinsî tîne

AMED (Pêşketin)

Li lêkolîna ku bi hezar jin û mêran re hat kirin, eşkere kir ku zewaca şaş dawiyê li jiyana seksê tîne. Tê diyar kirin ku zewacên ku bê hez kirin û bêevîn çêbûna pirsgirêkên cur bi cur derdikevin. Her wiha di lêkolînê de tê diyar kirin ku zawac baş be jî di nava demê de jiyana cinsî hêdî hêdî qels dibe. Lê gel vê vê yekê jî mêr û jinên beşdarî lêkolînê bûne ji zewacê gazincan nakin û diyar dikin ku aliyên erênî yê zewacê ji aliyên neyênî geleki zêdetir in.Jin û mêr di bersivên xwe de diyar dikin ku her çiqasî di jiyana zewacê de cihêtêkiliyên cinsî kêm dibe jî, ew ji dê û bavtiyê, ji jiyaneke bi istiqrar kêfê distînin. Ji sedî 67ê beşdarên lêpirsînê diyar dikin ku ew bi jin an bi mêrê xwe re êdî dibin wek xwişk û bira û ji pêwendiyên cinsî zêde kêfê wernagirin. HAWAR NET.com



Kesayetiya şîzofrenîk nexweşiyeke çawa ye?

Kesayetiya şizofrenîk yek ji cureyên kesayetiyên nexweşketî ye. Tabloya gelek nexweşiyên psikolojîk e. Di raman û tevgerê de bêwateyî, kêmketina têkiliyên rojane, di axavtinê de dijwarî, têkçûna jiyana sosyal, jarketina laş hwd ji sîmptomên wê ne. Kesayetiya şizofrenîk nişaneya gelek nexweşyan e, divê li klînikan were tedawîkirin..

Dermanên mîgrenê dibin sedema serêşên din



AMED (Pêşketin): Hay ji dermanên êşbirê hebin. Dermanên ku bi tedawiya mîgrenê têne bikaranîn di nava demê de dibe sedema serêşên cûda.
Li gor lêkolînekê derket holê ku dermanên ku bi tedawiya mîgrenê têne bikaranîn di nava demê de dibe sedema serêşên cûda.Di lêkolînê de tê diyar kirin ku "Dermanên êşbirê di serêşê de pir tê bikaranîni nexweş bi dermanê rehet dibe, kesên xwedî nexweşya mîgrenê jî dermanên êşbir bikartînin. Lê di nava demê de dermanên han dibin sedema serêşên din. Ji ber vê yekê jî divê nexweşên mîgrenê divê biçin doxtorê..HAWAR NET.com

Ji bo tespît kirina krîza dil rêbazek nû

Li gor lêkolîna ku di kovara Komelaya Bizişkî ya ya Emerîkî de hatiye weşandin kalsima ku li demarên dil de dikare bibe nîşaneya nexweşiyên dil û krîza dil.Zanyaran diyar kirin ku bi tespît kirina rêjeya kalsîuma di demaran de dikare zû teşxîsa nexeşiyên dil û demarê were tespît kirin.

Gelo galaksiya me de çend gerstêrk hene?

AMED (Pêşketin): Bi metodeke taybet otopsiya galaksiya me hate derxistin. Li gor otopsiya astronomîk li galaksiya me gellek gerstêrk hene. Li gor hesabên zanyaran di galaksiya Kadizê de nêzî 3,5 mîlyar gerstêrkên kevirî hene. Li gor texmînan ji nava wan 3,5 mîlyar gerstêrkan îxtîmala bûyîna gerstêrkeên wek cîhana me ku tê de jiyan karibe hebe encax beşekê pir kêm a vê hejmarê ye. Ji bo ku jiyana wek li cîhana me derkeve holê temen û şêwe û şêweya stêrkê wê û teybetmendiyên cûda cûda bêne cem hev.



“Dev ji heyvê berdin hedef Mars e”

Di salên 2030î de wê mirov biçin ser Marsê. Di mehên bihûrî de bi talîmata Obama NASA diyar kiri bû ku ew dev ji projeya çûyina ser heyvê berdane. Ji ber vê yekê jî li hemberî Obama nerazîbûnên raya gîştî ya Emerîkayê derketibû holê. Obama bi daxûyaniya xwe ya dawî bêhna gelê DYE ifreh kir û got astronotên me wê heta salên salên 2030î biçin ser marsê û ez hêvî dikim ku wan rojan bibînin.
Her wiha serokê DYE diyar kir ku ji bo NASA'yê budce hatiye zêde kirin û heta 2015'an bi seferên bi mirovî biçin ser astoîdeki.

Gelo sedema karsetan germbûna giloveriyê?

Her çiqas îddayeke ne îspat kirî be jî tê diyar kirin ku gûhertina demsalan ku ji ber germbûna giloverî pêk tê dikare erdhêj û teqina çiyayên agirîn zêdetir bike. Zanyaran eşkere kirin ku tevgerên di atmosferê de yanî germbûn di salên pêşiya me de dikare zêdetir bandorê ser gûherîna tevgerên jeolojik. .

Ev kevirên girover bi sedan sal berê ji bo çi hatine çêkirin?

Îddayên derbarê wan keviran de gellekin. Kevirên girover ên Kosta Rika bi salane dibe sedema spekuleyonan. Di gellek welatên Emerîkaya navîn de kevirên giloverî ên pir baş hatine çêkirin hene. Giraniya kevira herî mezin digehêje 16 tonî û gellek kevir hene. Heta niha zanyaran fam nekirine ku ev kevir çawa hatine çêkirin û ji bo çi hatine çêkirin. Kevirên han herî zêde li kosta Rikayê hene û NY amadekariyan dike ku ji bo vê derê statuya Mîrata Çandî ya Cîhanê bide.. Li gor îddayan kevirên ahn wek nîşaneyên gerstêrkan hatine çêkirin. Îddayeke din jî eve ku têkiliya kevirên han bi UFO'yan re heye. Derbarê wan keviran de tu çavkaniyên nivîskî nîne û ji ber vê yekê jî tu îdda nayên îspat kirin.. HAWAR NET.com



Microsoft jî telefon çêkir

Şîrketê nivîsbariyê Microsoft telefonek bi navê Kin One û Two derxisti bazarê. Telefon bikarhênerên ciwan hedef dike û bi taybetî giranî dide pêywendiya torên spsyal ên wekî facebook, twitter û myspace..



"Em hemû hinek Neandartel in"

Ger ev îdda rast be em hemû hinek Neandartel in.. Heta niha wisa dihat zanîn ku bi derketina Homo Spiensan, Neandertal ku cureyeke din a mirovan e wek "mirova hov" tê binav kirin hêdî hêdî ji holê rabûyê. Lê bi saya lêkolîneke herî berfireh aser DNA'yan derket holê ku bi îxtîmalake di navbera her du cûreyan de danûstandina çêl (tov) ê pêk hatiye. Wisa tê texmîn kirin danûstandina han beriya 60 hezar sal berê pêk hatiye.
Yanî li go îddaya lêkolînê hemû mirov kêm be jî xwediyê genên Neandertalan e..

2020'an de dê 25 mîlyon kes ji ber 'dil' ê bimirin

Her sal ji ber nexweşiyên dil û demaran 18 mîlyon kes jiyana xwe ji dest didin. Wisa tê texmîn kirin ku ev hejmar di sala 2020'an de bigehêje dore 25 mîlyonî. Zanyaran diyar dikin ku Êdî nexweşiyên din di ciwanan de jî pir tê dîtin û sedema serke ya vê yekê guheritina xwarinan û jiyana bê hereket e û cixare ye.



Amadebin! "Iron Man 2" tê

AMED (Pêşketin)

"Iron Man 2" ku roja înê 7-ê Gulanê li DYE dikeve vîzyonê di hin welatan de beriya hefteyekê kete vîzyonê.Paul Dergarabedian, serokê Box Office ya taybet bi flîman, dibêje ew çaverê dike ku "Iron Man 2" pitir ji 120 milyon Dollaran çê bike dema li sînemayên Emerîka û Keneda were pêşkeş kirin."Iron Man 2" heftiya bûrî li 6,764 sînemayên 53 welatan hat pêşkeş kirin û dahata wî flîmê li Berîtaniya 12.2 milyon Dollar û li Koreya Başûr 10.8 milyon dollar bû.

Film di aliyê efekt û teknika xwe de xwedî îdda ye.

Nasname
Cure : Aksiyon
Dîroka nîşandanê: 7 Mayıs 2010
Deyêner : Jon Favreau
Senaryo : Justin Theroux , Don Heck , Jack Kirby , Stan Lee , Larry Lieber
Mûzîk : John Debney
Çêker : 2009, DYE
Lîstikvan
Scarlett Johansson (Natasha Romanoff / Black Widow) , Robert Downey Jr. (Tony Stark / Iron Man) , Sam Rockwell (Justin Hammer) , Samuel L. Jackson (Nick Fury) , Leslie Bibb (Christine Everhart) JI BO ZÊDETIR NÛÇEYAN SINEMAKURD





Hevpeyvîna bi stranbêja rapê Dezz Denîz re

GOTINÊN DEZZ DENÎZ DI CÎHANA HUNERÊ DE DÊ DENG VEDE...
- "Kesê ku mîkrofonê dike destê xwe, dibêje ez hozan im"
- "Hinek kes medyayê ji bo populariteya xwe bikartînin; medya jî li dû kesên navdar dimeşe"
HEVPEYVÎN (HAWAR NET) -- Hunermanda dengxweş a rapa Kurdî ku yekem jina ku Kurd ku bi rapê distrê bersiva pirsên HAWAR NETê da û behsa jiyan xwe mûzikê û projeyên xwe yên nû kir. Daxûyaniyên giring da...

HAWAR NET: Tu dikarî derbarê destpêkirina xwe ya bi muzikê biki?
DEZZ DENÎZ: Min di zarokatiye xwe de dest bi nivisandina stranan kir. Eleqeya min a li ser muzikê wek ez dizanim hertim heye. Ev 8 salin ku ez bi Hip-Hopê re mijûl im. Performansa min a 7 sal a li ser dikê heye; herwiha min perwerda dans û muzikê standiye.
DEWAMA HEVPEYVÎNÊ DI www.hawarnet.com DE

Albûma stranbêja nû Newroza; "Nû" bi we re ye

AMED (Pêşketin): NEWROZA bi albûma xwe ya cihêreng gava xwe ya pêşin di mûzika Kurdî de avêt. Albûma newroza a bi navê "Nû" ji mûzîka Kurdî ya gêlerî cûdatir e û bi forma xwe ya cewaz pencereyeke nû ji bo mûzika Kurdî vekiriyê.Zêdetirê stranan aidî Newrozayê ye.Her çiqas albûma "Nû" xwedî bingeha mûzîka popê be jî têde şêweyên mûzika Kurdî û mûzîka gelên cûda dihewîne. Her wiha dengê xweş û cûda ya Newroza jî balê dikşîne. Jê neminin.

"Rewend" a Aynûr derket

AMED (Pêşketin): Albuma nû ya Aynûrê Rewend dê ji Sony Musicê derket.
Klîp ji bo strana Rewend ku navê xwe daye albumê hate kişandin. Klîpa nû ya Aynûrê dê balê bikişîne ser Heskîfê ku di bin xetereya windabûnê de ye.. Hunermanda navdar a Kurd ku bi strana "Keça Kurdan" deng veda bû bi albûma xwe ya "Nûpel" jî cihê xwe yê di nav muzîka Kurdî de zexm kiribû niha bi albûmake nû derdikeve pêşberî hezkiriyên xwe.
Li gor agahiyan di albûma dawîn a Aynûrê de dîsa stranên bi formên gêlerî zêdetir cîh digrin û çend stran jî bi şêwazên cûda hatiye amade kirin.

Kitêba Latîf Epozdemîrî Dîlbeyar derket

Kitêba Latîf Epozdemîrî ya 7'an ya helbestan, ku keda çend salaye,bi navê DİLBEYAR di nav weşanên Veng de derket. Helbestên DİLBEYAR helbestên bijare ne ku niviskar bi xwêneran re parve bikim. Li ser berga pêşîn a kitêbê , wêneyek Ehmed Guneştekin heye. Kitêbê ji alîyê teknîki ve Kamer Beysulen mizanpaj kirîye.

Dilbeyar 140 rûpele û birîte ji 95 helbestan.Di kitêbê de gelek helbestên dilîni, evîni u civakî hene. Helbestên kitêbê hinek caran serbestin u gelek caran jî bi kêşe u kafiye ne.

Komên paşverû serneketin û festîvala Tangoyê pêk hat



FLi Amedê Festîvala Tangoyê ku ji aliyê komên paşverû ve hate xwestin ku were betal kirin pêk hat. Li Amedê dê navbera 30 Nîsan - 2 Gulanê festîvala Tangoya Arjantînê li dar dikeve.. Diyarbekîr ku wek navenda serekya tevgera Kurdî tê zanîn di salên dawî de bi oganîzasyonên navnetweyî dibe bajareke çand û hunerê jî. Lê komên paşverû yên li Amedê ji bo asteng kirina vê pêşketinê çi destê wan tê dikin. Hember organîzasyona tangoyê jî doh komek ji HUR-DER ku komaleye radîkal Îslamîst e nerazîbûn nîşan dabûn. Di festîvalê de bi stranên Ciwan Haco tango hate pêk anîn

Fîlmê «Bexçên bihiştê» derbasî sînemayên Swîsrayê dibe

Fîlmê derhînerê kurd Mano Xelîlî (Mano Khalil) Bexçên Bihiştê: Çîrokê bexçên Swîsra„ roja 6ê gulanê derbasî sînemayên mezintrîn bajarên Swîsrayê dibe. Destpêkê galaya filmî dê roja 5ê gulanê li paytexta Swîsrayê Bernê bi muzîk û şahiyê di sînemaya CineMovieyê de seet 18:30 bê li dar xistin. Herweha roja 6ê gulanê li bajarê Zurichê bi başdarbûna gelek siyasetmedar, hunermend û ronakbîrên swîsrî film dê di sînemaya Arthaus-Piccadillyê de seet 18:30 dîsa bi muzîk û şahiyê dest bi weşanê bike. Herweha di eynî demê de ev film dê li bajarên weke Basel, Luzern, St. Gallen û gelek cihên din bê temaşe kirin.

www.kurdiwakurdi.com

Pêşketin

Versiyona çapkirî ya HAWAR.NET comê / Çapa Dijîtal

Nasname:
Rojnameya Pêşketin – Versiyona çapkirî ya HAWAR NET.com'ê Çapa Dijîtal
Xwedî û edîtorê gîştî: Serhad B.RÊNAS
Gêrînendeyê Gîştî-Edîtorî: Mihemed ZERAX
Navnîşana webê: www.hawarnet.com / Têkîlî : agahi@hawarnet.com
Pêşketin weşanete Hawar Kurdistan Media Group e. Dezgehî: www.hk-mg.net

Nûçeyên ku di dawiya nûçeyê de bi dest nîşana Pêşketin an jî HAWAR NET.com hatiye dayîn alîyê HAWAR NET.com encax bi cawkanî nîşan danê dikare bê bikaranîn.

Keça kurd Şîla xwe ji bo olîmpiyatan amade dik

Keça kurd a bi navê Shîla Panjavî (18) bi tempoyeke mezin xwe ji bo Olîmpiyatên 2012'an xwe amade dike. Shîla Panjavî keça, bavêki sporist e. Panjavî ji 8 saliya xwe heta niha Halterê dixebite. Panjavî got: "Ez ê li ser navê Kurdistanê tevli van pêşbirka bibim.Ez berê jî tevli bibû. Lê min Britanya temsîl kir.

Ciwanên Çînî çavên xwe aciz in

AMED (Pêşketin): Di Li Çînê pêkanîna operasyonên estetîkî pir zêde bûne.

Mirovên çînî pirtir ji çavên xwe yê kiflandî aciz in û gazinan dikin. Ji ber vê yekê 100 ewro didin û bi oparasyoneke estetîkî çavên xwe gilover dikin. Li Çînê ji bo operasyanên estetikî dor nîn e! Ji sala 1980'yî vir de cerahiya estetikî qedexe bû. Lê niha bûye karekî ku pir diravan kar dike. Li tevahiya Çînê hejmara klînîkên estetikê nêzîkî milyonekê ne û di salekê de çarçoveyakar dijîhîje 3 milyar dolarî.

Bi tenê li Pekînê cihê ku estetîk tê kirin 100 heb in. Weke mînak: Buhayê çêkirin û mezinkirina pêsîran ji 600'î dest pê dike heta 2900 ewroyî diçe. Ênku dixwazin piyê xwe dirêj bikin divê 3 hezar ewro ji çav derxin. Lê çînî pirtir ji çavên xwe yên kiflandî gazinan dikin û ji çavên gilover hez dikin





Jina zêde xweşik dikare bibe sedema nexweşiyê

Jina xweşik xetere

Li gor lêkoîna zanîngeha Valencia ya li Spanyayê derket holê ku wexta zilamek li jinekî biyanî û pir xwelik re tenê bimînin stresa nav laşê digehêje asteke xeter.

Di ceribandinê de 90 ciwanên ku bi jineke xweşik re hatin tenê hîştin bi avayekî zû hormona kortizol gellek zêde bû.

Zanyaran diyar kirin ku stresa han dike nexwşiyên wek diyabet, tansîyona bilind û nemêriyê. HAWAR NET

Beşekê din a peresana mirovan derket holê

Beşên winda yên pêvajoya peresana mirovan derdikeve holêPerçeyeke nû ya pêvajoya peresan (evrîm) a mirovan hate dîtin.

Cureya nû xwedî taybetiyên him mirovan him jî meymûnên mirovî ye. hate diyar kirin ku fosîlên han ku aîdî cureyeke nû ye pêvajoya peresanê mirovan ronîtir dike. Ji bo ev cureya nû navê Australopithecus sediba hatiye dayin.

Serkeftiyên lîga Kurdistanê tên xelatkirin

Endamê Yekîtiya Futbola Kurdistanê Dilşad Salih, diyar kir ku dê di dawiya vê heftiyê de, qehreman û baştirînên lîga nayab ya futbola Kurdistanê bên xelatkirin.Dilşad got, "Roja 5'ê vê mehê di merasîmeke mezin de ku di bin çavedêriya Serokê Komiteya Olompiyada Kurdistanê tê sazkirin, dê tê de qehreman û baştirînên lîga nayab ya futbola Kurdistanê bên xelatkirin".Salih wiha berdewam kir, "Dê di merasîmê de 75 milyon dînar bi qehremanên lîga nayab ya Kurdistanê bête dan û tîma xwediyê pileya duyem 50 milyon dînar û tîma xwediyê pileya sêyem 35 milyon dînaran werdigrin, her wiha îsal me biryar daye ku xelatan bi ser gogbazan de parvebikin, ev jî wekî rêzgirtinekê bo hewl û mandîbûnba wan e".Hêjayî gotinê ye ku tîma Hewlêrê naznawê werzê îsal ya lîga nayab ya Kurdistanê desteber kir û her yek ji tîmên Pêşmergeyê Silêmanî û Kerkûkê pileya duyem û sêyem bi dest anîn.

Dara 4798 salî li ku dijî?

Kezika rêxê kezika herî bihêz e



Kêzika rêxê ye lê...

Li gor lêkolînekê kezika rêxê kezika herî bihêz ya cihanêyê. Navê kezika rexê ya zanistî "Onthophagus taurus" e. Ji ber ku rêxan kom dike û dixwe ji wî re dibêjin "kezika rexê".

Li gor lêkolînê derket holê ku ev kêzik ji 1141 car zêdetir giraniya xwe bikşine. Ev tê maneya ku mirovekî 10 otobusê yanî 80 tonê hilkişîne.

Wisa tê texmîn kirin dar hê dikare bi dehan sal biji. Yek ji darê herî pir hê jî dijî dara qajê a Bristlecone ye.Darê han pirr hêdî mezin dibe. Li DYE di eyaleta Kaliforniyayê de dijî. Navê wê "Metuşelah" e. ev nav di Încîlê de ji bo kesê herî pîr tê gotin. Ev dara ku li gor lêkolîna zanyaran temenê wê 4798 derketiye niha di bin parastina dewletê de ye û cîhê wî tam li kû ye nayê eşkere kirin..

Divê jin ji nexweşiya Vajînîtê haydar bin

Vajînît yek ji nexweşiyên mikrobîk ê bi jinan re ye.. Wekî ji navê wê kivşe ye, înfeksiyoneke vajînayê ye. Guhertinên hormonî, bikaranîna hin dermanan, jiyanên awarte, stres hwd dibin sedem ku dengeya asîdê li mûkozaya organên zayender xerabibin.

Gelek cureyên îltehebê hene lê ya pirr tê dîtin, îlteheba ku bakteriya Candida albicans pêk tîne ye. Bakterî dikare bi riya têkiliya cinsî, oral hwd derbasî yekê din bibe. Hin caran cureyên antîbiyotîkan bikêrnayên.







JI BO REKLAM Û ÎLANÊN WE

Hûn dikarin di Pêşketin, HAWAR NET.com an jî weşanên din ên koma HAWAR de reklam û îlanên xwe bi nirxa herî gûncaw biweşînin.

têkîlî agahi@hawarnet.com